# Çiya

## Arif Xelîl

## (Bavê Gulê)



Institut kurde de Paris

# Pêşgotin

Di dîwana çiya de helbestvanê hêja arif xelîl bavê gulêbi dil bawerî û ramanên bilind ev dîwan nivisîyetibabek helbestên bi zimanê kurdî di van rûpela dene

# Beşê oldarî

Di vî beşî de helbestvanê mebehweriya xwe dirust dike û bi dil şewatî gaziyên xwe ji xwedanê dilovan re dike û dibêje

# Belengaz

Belengazin tu zengîne      li jor halê me bi bîne
rehma xwe tu ji mera
bişîne
tenik halin xwe bi megîne
kes wek me tune ji sêvîla   ji bê çar û bê melûla
tu zengîne ji delîla         li biner em sêwîne

# welat perwerî

di warê perweriyê de helbestvanê me kul û derd û mereqên xwe şanî dunyayê dide û mîna keçeke nazdar welatê xwe dibîne,,,,,

Institut kurde de Paris

# kurdistana rengîn

zanim tu rind û ciwanî dêm gulî û esmere
herdû biryên te tarîne bijank tîr û xencere
xêre dêmên te guhertî rengê te bûye zere
ilet û cewr û cefayan tu istand ser bi ser

helbestvanê me hestên xweyî neştimanî diyar dike bi rengakî vekirî ko li ser axa sûriya yê diaxive ûhevpariya miletên cuda ji ereb û kurd û ermenan û gelek miletên din divê axêda

# suriye

suriye erdê me gişka kurd û ereb birane
şam ji mera paytexte xweş û rind û ciwane
li ber dila bihaye navê wê pir girane
em ji erdê şamêne warê meye ji kevnar
pambik dide nîvane ji mere bûye şûnwar

Institut kurde de Paris

# navdarên kurda

di vî berîde helbestvanê meyî hêja li ser gelek navên mezin cihgirtî di dilê kurdan de radiwestin mîna barzaniyê nemir û mamoste kemal ehmed derwîş û şêx muhemed di rêbaza bilind û hêja de rêç û xebata berzaniyê nemir şanî me dide di evan xêzên jêrîn de

# gora serok berzanî

pesindarê navê temeger tim saxbim li virê
gora te kaba kurdaye camêr civîn li dorê
di rojin tarî teng da son dixun bi wê gorê
em bernadin berxwedanê ger dujmin bike zorê

# civakî

her weha helbestvanê me yî hêja civaka xwe jibîr nekirye,,pesnê ciwamêriyê dide û kesê zana û tirsonekşermezar dike,,

# camêrî û çekûzî

camêrbûn tacek zêriye da serê xwe camêra
bi wê xemlê hew şêrînin ronya xwe dane dera
hatimê tay û cebelî çûne ava di gora
yek bi denge li nav ereba du hezar sal çûn di sera
ê dî mayî li nav kurda ketî kutub û deftera

# evînî

di beşê evîniyê de xwe vedike ji dost û hevalanre,,bi kêf û eşq bi bal sura bayê evîniyê ve diçe û wiha gotina rêz dike,

Institut kurde de Paris

## bayê sibê

rabe em bînkin bi hevra ji bîna bayê sibê
berî xelik rabê ji razanê xulmaş bibê ji xewê
xaş qebqeba moriyê di tê dengê kewa li pozê çê
ça serxweşe mest ketiye ji wa kêfa pir delal
di herikê li kêlekê kaniya ava zelal

## stiran û filiklor

helbestvan arif bavê gulêgelepûrê xweyî kurdî jibîr nekirye ,,çend helbest ji kultûr û civaka xwe bijartiye bi evan gotinangelepûrê xwevejandiye û xistiye nav destên xwendevana de ko ev kultûrwinda nebe û her çax di bîr û baweriya me de bimîne,

## çayê bilind

berfa kevin û nû li ser te digê hev
xelik şer dikê li ser te digrê hev
mirin bi ro nema kuştin ketî şev
zor û istihkam li ser te bûne dev
dibin zulmêda te çav dane hev

## ebdulrehman alûcî

**tebax 2010 an**

Institut kurde de Paris

# Diyarî

Vî berhemî diyarî gora şehîdên kurd û kurdistan dikim û diyarî hevjîna xwe diya gulê dikim çingî ew bû sedema derxistina vê dîwanê di bû piştevanek bi rext û tiving li pişta min disekinî di gel qevdek gulên kesk û sor û zer û spas

Institut kurde de Paris

# Hekîmê derdan

Bila navê te bimîne li ser zimana dem bi dem
Dil û ciger ger ziya bû tu ji wara kanî û çem
Pir ez ketim ziqifê teng jiyan dibû sar û germ
Xelas kirim ji êş û derdan hinda dibûn derd û xem
Heqe şevê bi te şîn kin hekîmê derdan tuye

Di kutka oda em tunebûn te em dane ji xweber
Ji talmakê bûne peyda ji vê axê em hatin der
İlm û zanîn me nizanî quran me kirî ezber
Rast û çpê xwe me naskir li dunyayê xêr û şer
Ya reb tu li me veke derî her dem berê me tuye

Xêr û bêra te pir barî erd tije bû ji baranê
Bi emrê te em hatin vir bûn nîvanê cîhanê
Roj û şevê tu di gerînê bi ezmana tu kanê
Te can daye canlî û lan kî li kuye tu zanê
Ger emana xwe em bikin guh darê jaran tuyî

Felek şîne tim di gerê li pê hevdû şev û ro
Dewranek tê yek di herê xelk û alem di bê zo
Li dawiyê lorandine nasekinê li ci go
Talya jiyanê mirine hev qanûna di birê mû
Ya reb tu li me veke derî şivanê sêwiyan tuyî

Institut kurde de Paris

Dilo tu me mîn bi kesî li guneh karan narin sal
Merî davcî bi dava dikevê karê wan boş û betal
Rêka durust tu ber mede xwedê yê bibê heval
Nan û danê wî me xwarî bê minet bi meh û sal
Em omîda xwe nabirin xwedanê canan tuyî

Çû xezal di hen ser avê  ezim tiyê te bi dil
Xelk û alem bûye dijmin giran bûye barê mil
Di bin nefsa xuda reatim nikam berdim pişta kul
Dengê şurka têye min deşt û çiya bûne şil
Rê û yolaqê me qutin rêberê jaran tuye

Ya reb ji mêjda me bihîst tu cîhanê di gerîne
Te hin anîn vê dunyayê hina li şûnê hiltînê
Tîr û kevan di avêjim nîşana xwe hilnînê
Li ser te mayî heyfam rakê tola min tu hilînê
Ger min kir gazî bi bîse guhdarên jara tuyî

Va mileta ji mêjve bin deste çiqa çûne meh û sal
Gelî çûne di eynêra li dîm çêbûn sed newal
Çûk û mezin tevda ratin keç û bûk û xort û kal
Zanin tune ji xeynî te ji bar ketiya ra heval
Tev wane li ber te di gerim hekîmê derdan tuyî

Hîn hin hene li deşt û çiya di şeva reş û tarî
Ya reb tu wan bi parêze pûk û berfa te barî
Bela çavê te li wan bê li ber wan hustê min xwarî
Li bin destê koledara jana zirav dil xarî
Ya reb tu li me veke derî omîda kurdan tuyî

Institut kurde de Paris

Ya reb tu mebesta me zanê heqa gerîn der bi der
Mizgeft û camî me dan hev têda dîn xelq û beşer
Jidandina te me dî bû reş û sipî sor û zer
Her tişt bi emrê te çêbû ne çêbûye ji xweber
Rê bi mala te dikevin ya reb berê me tuyî

Xweşiyê dunyayê pirin neqş û nîşan û sedef
kêf û şahî di xemlînê lê dikevê saz û de
Li alîkî tê lorandin bi dengê xemgîn mû zirav
Rondik dibarin ji jor da ji çava di têne tav
Dilê şikestî bi cebrîne mebesta hejara tuyî

Ji zayînê ta bi mirnê raman dikim di vê xetê
Çerxa felek ger û dewre xelkê dikê xewletê
Serê tîra wê bi xwîne taliya miryê wê tê
Nîşan dil û can di kêye ketime wê qesawetê
Ya reb tu bi hêsanî wîne pişt gêrê jaran tuyî

Xweşiya dunyê naxwazim min gî daye alîkî
Qesr û qonaxê cîhanê ne hêjane darekî
Te gul dane serê şaxa sosin dane bi halikî
Ger bi xazê tê wa arkê hinda bi kê bi arikî
Tayê te tune li wicûdê ya reb berê me tuyî

Rizqê xelk û vê alemê te kiriye ezmanê jor
Box hilkişand ji derya kûr veqetand ji ava şor
Ba lê dixê di weşînê li ser erdê qor bi qor
Ro li xunavê dikevêye hilde keske sor
Can li olan ji te di xazê ya reb berê me tuyî

Institut kurde de Paris

Ji dest pêkê heta niha ta bigînê dawyê
Kes namînê li va wara ne mirê li ser faniyê
Rojik werê tê me rakê ji vê axê bi boriyê
Tê me komkê li mehşerê li jor bigrê ser siyê
Kê bi tera dost û yarbê ê ji nte bike reçuyê
Ya reb tu dosiya me pakke deste gêrê me tuyî

Riziq te da li cîhanê baran barî ser bi ser
Hina rizqê xwe qola tê ber wan di tê ji xwe ber
Ê wek min jar û sefîl bê tim di gerê der bi der
Li dû nanê xwe tim rate bi serda kul û keser
Derd û bela lê dicivin ji xeta rast di tên der
Ya reb tu gunhê me bimal ê vekê derya tuyî

Institut kurde de Paris

# Hawar dikim

Hawar dikim meded meded serwerê me resûlelah
Ekê çêkim herf û bêta meded meded dîsa elah
Xeml û xêza te pir rinde navê te navkî bilinde
pê xemilîn şar û gunde her meded ya resûlelah

li ber deryê te rawestim bê çar û jar em mestin
ji nîvê dilê xwe şikestin her meded ya resûlelah
canêm dêşe dil bi taye ji te bêtir kes nemaye
li cem xwedê tu buhaye her meded ya resûlelah

dil birîne tu dermane nexweşim ez tu luqmane
were ser min bes tu cane her meded ya resûl elah
were ser min te bi bînim li dor te dil bi gerînim
nikam bîrkim wa bejna te her meded ya resûlelah

dengê çûka li pîkê dara di xulxulin li buhara
di naline li ser yara her meded ya resûlelah
te bi pesinin em şadibin derd û kulê me çêdibin
ji baxê gula nêzîk dibin her meded ya resûlelah

gelî dosta gelî yara qesir qûm û pelê dara
bi ziman bêjin gelek cara silav li te resûlelah
li ber dilê me tu yarî hezar rehme li te barî
tu li va dilî tucar narî her meded ya resûlelah

Institut kurde de Paris

va em hatin ji medînê ji cem xwedanê mizgînê
ya reb tu me xecil meke li ber teraz û mêzînê
canim npesna te rêberî silav li te pêxemberî
hezkirina te serwerî her meded ya resûlelah

ji dil bibên ji dil bêjin hêstirên xwînê birêjin
bêjin elah bêjin elah her meded ya resûlelah

Institut kurde de Paris

# Belengazin

Belengazin tu zengîne li jor halê me bi bîne
Rehma xwe ji mera bişîne tenik halin xwe bi megîne
Kes wek tune ji sêvîla ji neçarî ji melûla
Tu zengîne ji delîla li me binêr em sêwîne

Rê li pêşa me girtîne li ser rêka di perpitin
Bes em deryê te dikutin ya reb halê me bibîne
Ya reb tu li me veke derî tengijîye li me serî
Tu bi cahê wî serwerî li tu çola megerîne

Tu mezine li der zemana erş û kursiya te li ezmana
Sebram nema di halê hana bes tu hala di gewrîne
Em gerîne li camî û dera em xizanin ji zîv û zêra
Çi diyarkin em ji tera tu vê hewceye tu zengîne

Şorek xweş dikim diyarî mîna gula li buharî
Fermo ji tera ji min feqarî nizam çilo bi te gîne
Çiqa fikrîm di ezmana di dar û bera di însana
Em ketibûn pir gumana ya reb dilêm ber xwe bîne

Erdê min bê çarî gewrê nêvî çaye bi serda kevir
Çi gorîkim hew vê bere li me rûyan me çêwirîne
Ya reb tu şahekî pake mirin li vê dunyê cake
Hecî bi dil te nasnake ji dil kore te nabîne

Institut kurde de Paris

# Tu ne kevin û ne ecere

Tuye şahê ins û cana tu sultanê qehremana
Tu xwedanê du mîzana subhanela disa ji tera
Adem te da bi çar gava husna delal te da çava
Mane tu kê bibê ji nuva ins û cin û va dewara

Ji tunebûnê te peyda kir ezman çêkir bilind rakir
Kewn û mekan te ava kir te xemiland bi istêra
Tu ne pirre ne hindike tu mezine ne bi çûke
Alem tevda te nasdike tu meqsûde li gî dera

Tu ne kevne ne ecere tu ne renge ne cewhere
Tu ne kewne ne xwibere roniya tera wekî çira
Hinek îro pir şaş bûne ji rêç û riya te dûr bûne
Bi çavine li kor bûne xwelî li wan li nav mêra

Mîman denka te em çandin bi dilovanî te em gandin
Mezin kirin te em şandin digerîne di çolara
Ro bi ro temen diherê destarê temenê me digerê
Şev û roj çû venagerê yawaş yawaş li va wara

Dunya navend û gerace me çi qesde çi armance
Ge erd rinde ge qerace xêr û bêra te ji mera
Li navenda te rehmanî li dor erşa te ey manî
Melaîka serê danî ban te dikin subhanela

Subhanela subhanela subhanela disa ji tera
Subhanela subhanela ji dilê birîn tev kesera

Institut kurde de Paris

## Ser siye quranê

Rabe tu ji xewê vê sibê xoce dixûne li minarê
Royê pêncara bandikê sibê û nîro û êvarê
Şahê mezin di pesnînê kewn û mekan wî dayî
Navê muhemed vêra tê gurzek kulîlk ji derê

Rabe tu bejna xwe qorke serê xwe tu bike xwar
Xata xwedê rêkik raste têra mere tu dil sar
Çiqa bigerê çerx û felek li jiyanê gî boşe
Ji xeyrê taeta wî şahî temenê me tevde zirar

Te da adem vê cîhanê hewa jêre kirî bûk
Eşq û evîn mezin dibê bes di dilda hebê çîk
Mane baran ji jorda tê hiltên li bana birûsk
Tuye sebebê alemê ger bi barê berf û xûsk

Ey mubarek sed tebarek te daye kewn û wicûd
Tuye wacibê wicûdê ji tera heqa sicûd
Li axretê kes tuneye di ser tera ey xweda
Camêrê camêra giya di merkeza dilde mabûd

Va jiyana tev yalane ger tu bibe pîr û kal
Tişt namîne ji xeyrî te çerx digerê bi meh û sal
Kevin û ecer gî di herê mirin vêra tim heval
Bes dimînê şahê mezin li dunya boş û betal

Institut kurde de Paris

Xelk û alem te di pesnînê xwe xwar dikê ji tera
Tuye sultanê cîhanê roj hiltêye di sera
Kewn û mekan li ber hukmê te tev di bê ye ker û lal
Tên sicûdê bi emrê te li cîhanê li gî dera

Husn û cemala şêrînan di çilmisê ro bi ro
Gog digerê bi hukmê te li dû hevde bi şev û ro
Warind bûna ne gereke ger rihê me nebe zo
Canê canan sucde heqe ji dil û can wek te go

Rabe ji xewê bavê gulê mere tu bi nefsê da
Ji quranê tu bixwîne ilmê ilmayî tê da
Carkê binêr tu geştî ku berê te çûye kuda
Wer tu li wî baxî vehêse rûne di bin siyê da

Institut kurde de Paris

# Bi serda dilê min birişt

Ez dizanim emr û fermanê te raste ey xweda
Tu hekîmê jêr û jore ger cîhanek te bida
Di wê gavê ji mafê te bo siktirîyek te bi meda
Li va zulma tu li me dikî li çerxa dunê di cîda

Gelek zore pir zehmete hew xişime bi ser meda
Kurd ger berdê erd û ezmên ma ê herê hew kuda
Yek ji deha va miletî pir dixwest û te neda
Xelk zengîn û mal mezine xanedane ji teda

zar te dayî va insafa bi te razê ey xweda
kurd sêfîlin him êsîrin pir birçîne ji mêjda
tu camêre pir zengîne te zekatê xwe neda

li çol û çiya te em gerandin va mileta te dikuşt
li alemê rê windane koç me rakir tim bi pişt
te em kirin topa linga bi dest û pêyan te dixist
ma li erdê te me birî sûnd bi te bê çîçek tişt

te zinarek li me pir dî bi dev çira me te kuşt
te da turk û va ereba erş te kirin deşt
te helandin em şewitandin bi serda dilê me birişt
ma çû ekê bi tera bêjim hev qanûna te durist

Institut kurde de Paris

# bûme ser gewr

Ax felek bûme ser gewr hêla çogê min nema
Barê vê duyê girane ketime derd û xema
Ez dimeşim li kerbelayê beriya fût û fere
Rê û rêçê min windane şop li pêşa min nema
Temen çûye bûye berfa ser çiya tevde hilî
Dil sarbûme ji dunyayê ji gî çax û gî dema
Ê wek min hindane hîro tek û tûkin bi jimar
Bê heval û bê hogirim dinalim li ber kelema
Bav û bapîr barkirin li vê dunya kesk û şîn
Bes li bîra me hew mane rih firîn çûne sema
Çerxa felek tim digerê dunya li serê me bû teng
Dava dosta ez givişţim dame ber sed melzema

Ez dibêm gora tarî hîro ji mira çêtire
Li nav vî miletî bimînim heger nanê min nema
Dema em têda pir zore ji camêrê wek mira
Dema vîzon û dişaye çavê kil û melhema

Ê nizanê qanadê memka dêrîne hîro maye pir li paş
Tên firotan sêv û hurmî li nav kurd û ecema
Serkêş û serwerê hîro gerek wek vê demêbin
Diş dixunê di malada tu kêmasî qe nema

Institut kurde de Paris

Di pêş vêra kê çi werê em nizanin ey bira
Gul û sosin gelek borîn dem di tê li pê dema
Sala berê ne wek hîsalbê fedî û bê şermbû
Çîçek baran li me dibarî hîro tiştek jê nema

Hîro em hatin hewarê li ber xwedê digerin
Guhê ker di meyal kirî baran tune tê serma
Subhan ji navê tey bilindra dîsa çavê me li teye
Bê çar û xemgîn û hejar gî dinalin ji dest xema

Navenda axê me berda bi can em hilkiştin banî
Bûn nîvanê dergehê te xwedanê erd û sema
Dê veke deryê xwe li gunehkarê wekê min
Dur û cewher li cem te pirin hêviya me li te ma

Biweşîn berf û baranê bi sermeda ey xweda
De tu derya xwe rak banê avde dar û kelema
Çavê deşt û çayê bilind newalê kûr tev li tene
De tu şînke oza dila geliya bi herikîn av û çe

Institut kurde de Paris

# Pir poşmanim

Guneh karim pir poşmanim li ber deryê te nêvanim
Dil bi kul û bi kovanim ji efwa te ne bi gumanim
Kesîm tune ji xeyrî te derî veke li min elah
Şefaetke resûlelah

Haqa salin mam li dera bê qezencim ji mîlik û pera
Guneh karim hîn di sera hatim cem te bi bergera
Şefaetke resûlelah

Ez nexweşim bar giranim bi serda westî û bê xwedanim
Çi gorîkim ez nizanim tu me meşkîn ez nîvanim
Şefaetke resûlelah

Hatim cem te enatirsim ji efwa te ez di pirsim
Tu camêre ez miflisim li va dunyê di kerisim
Şefaetke resûlelah

Di bin bara helakim ez sêfîlim tim bê çarim ez
Di şeva tarî dinalim ez ne li bîra kesîme ez
Şefaetke resûlelah

Şeva ket eyda qurbanê ayet xandin ji quranê
Nûrek vêket ji îmanê şewqa xwe daye cîhanê
Şefaetke resûlela

Institut kurde de Paris

# Ey xweda

Ne awcîme e bi berxim tiştim tune e bi derxim
bê qurbanime bê berxim ez sêfîlim ma çi biderxim
Kesîm tune ji xeyrî te li me bi çava binêr elah

Hatim cem te bi bergera çav çekûzin ji hêstira
Qencî kêmin li cem berdera dilê xwe me anî ji tera
Kesîm tune ji xeyrî te tu dermanke dilêm elah

Me xwe li te girt tu me meşkîn qer û kîna bi mera meşkîn
Tune li canim derd û birîn dermanekî li derdêm bibîn
Ji xeyrî te kesîm nîne buharê li dil wîne ellah

Ez narim camî û dêra dilêm ne li pere û zêra
Dixwînim wek çûka hêra dilê aşiq tu tim vêra
Kesîm nîne ji xeyrî te xema rake wîne ellah

Ji merê xisma pir neyarin ji xelkêra dost û yarin
Li ser ê xwe hukum darin himber şêra berx û karin
Kesîm nîne ji xeyrî te gazî dikim meded ellah

Heqas salin eçav korim ji rêça te gelek dûrim
Mîna gula sipî sorim roj bi rojê e diborim
Kesîm nîne ji xeynî te dikim hawar di bêm ellah

Me rêç berdan ji hemî rêka me dest berda ji bav û dêka
Ez venaxum ji çeltîka dil aşiqim di hem sîka
Na ecbînim cilê bûka ez têr nabim ji kanîka

Institut kurde de Paris

# Eyda qurbanê

Serê salê çi diyarkim ez gorîkim ji tera
Cîhan bûye şeva tarî destim dûre ji pera
Bi serda xerîb û bê çarim di gerim der bi dera
Ji xeyrî dilêm tuneye fermo bûrim ji tera

Sersal û eyd va hatiye hin melûlin hin jê şadin
Hezkirin ba me windaye merî li me rû nadin
Xak û bira jî xarine nan tunebê rû badin
Bes yek sêfîl bê di vê demê çelkên mara pêyadin

Zêhêr li cîhanê belabû li dest va kesên nezan
Xizanî warekî pir tenge ê têda dibê erzan
Va zemankî pir çetine kes li me nabê xwedan
Ji xeynî rebê banî tune lê bikin gazî û eman

Ji birahîm qanûn mayî qurbanikî em bikin
Salê carkê dilê yara bi firavînê xweş bikin
Xêr û xêrata em bidin tayinê em zêde bikin
Rokê ji omrê xwe derbazkin bi dil ji hev hezbikin

Belê em mane li dunyayê ji dest xema pir dil sar
Çerx di gerê û diftilê carkê nabê bi mera yar
Derd û elem temen dixun bi ser meda ketin bar
Li pê hêviyê xwe em di hen qet nagînin wa tucr

Institut kurde de Paris

# Pencik af

Çiqa bêjim te bi pesnim xwedanê erd û sem
Kesî tayê te tuneye ne di çax û di dema
Kê bi benê te bigirê guh nade derd û xema
Rehmê te li xelkê dibarin veduxun av û çema

Sund bi wa bayê te dayî baranê pê di weşîne
Sund bi wa bayê te dayî nêr û mê pê li hev tîne
Sund bi wa bayê te dayî dengizê pê li hev dixîne
Tu li pêş û tu li paşê tu xwedanê mizgînê

Tu dilovane ya îlahî kes tuneya di ser tera
Ê tu dêndarkê dêndara gunehkare li gî dera
Di roja tarî û reşda cî tuneye li tu dera
Kes ji efwa te ne dûre alem te kirî bira

Şeva me çû şifaq derket ez quranê di xwînim
Pelka vir dawê da dibim pir ayeta di bînim
Ji dilê xwe da ez dixwazim ji kurdara bi xemlînim
Lê bi min zor û zehmete nikarim bi ser hev bînim

Gelî û newal ziya di binde hin demsal û dema
Tewrat û incîlê dixwînim xweş dibim ji derd û xema
Di baxçê quranê digerim  jê tê bîna ça û çema
Pê kêfxweş û dil şad dibim wek buharê tê li çema

Institut kurde de Paris

Me şev şînkir bi quranê ya reb tu me jibîr neke
Roja dawî li axretê tu rûyê me reş meke
Li nav koma dost û yara tu koça me raneke
Li koşka cinet û buhiştê tu ji mera cîkî seke

Kêmasiyê min pir hene ji kesîra xwe xwar nakim
Naçim tu dêr û mizgefta gul xoce û mela nakim
Lê ez dilê xwe diçêwrînim dixwazim ji êr çêkim
Dil her rokê çîk lê di nê sebr û tebatê nakim

Ya reb te daye va dila têda çandî xêr û şer
Tiştê ez ji te dixwazim tu çavê me mebe der
Talya me tu bi xêr wîne bi çê omrê me bib ser
Gunhê me tu li ber te razê pencik efê tu çeke ser

Institut kurde de Paris

## Dawî dûre

Çi tişt heye li vê erdê te dipesnê ji xwera
Tuye şahê vê alemê heft qat ezman di sera
Şev bardikê hîv diherê ro di tiye du dûra
Çerxa te qet nasekinê rawestin tuneye jêra

Nîşanê te gelek pirin rakir ezman te li jor
Bi mîzanê te xamlandî di ser hevre dane qor
Li ser vê erdê te insan da reş û sipî zer û sor
Ey xuda te gî tişt dayî belê te daye li gor

Li dost û yarê xwe dipirsim li pîr û ciwan li hogira
Li ruyê erdê belabûne li gundan û li gira
Kes ji wana ez nabînim ez dil şakim ji xwera
Pir diketin gora tarî mirnê birin bi xwera

Te go axret pir nêzîke hîv parçebû li ezmana
Li bi pîvana min dûre ne di va çax û zemana
Roj û hîv digerê li banî sitêrk hene li ezmna
Hîn dengiz nebûye agir bir ne avêt heywana

Nîşanê axretê pirin di quranê tê danîn
Zor û zulm û sitemkarî kengî koçê xwe danîn
Bûn xwedanê vê alemê perde û hicab hilanîn
Wê gavê heqê te heqe ya îlah elalemîn

Institut kurde de Paris

Pirtûka te pir fereye bi ro bi şev dixwînim
Wate kûrin gelek cara ez nikanim pê gînim
Hew zanînik  pir bilinde ji aqila hiltînim
Derî û derya qet ne çikê ecêba xwe dibînim

Subhan ji tera heqa salin va pirtûka te hiştî
Quran û incîl û tewratê ji hikmeta te miştî
Sê sefarê pê zebûrê teşbîh nabine tiştî
Hikmet wa pir bilinde ket can û gewde giştî

Institut kurde de Paris

# Bûn cîranê kevira

Bifkir carkê di dunya fanî ser ji nûva ey bira
Here seke goristanê tu bigera ji xwera
Kî ji wena tiştik birî ya ji zêr ya ji pera
Bûn xwedanê gora tarî bûn cîranê kevira
Çu wenda bûn çavê belek vemirîn wekî çira

Ya îlahî ya hebîbî te em dane ji çira
Va cîhana her û lose hin dijîn li ser vira
Hin kar dikin keda xelkê ji cî hildikin kevira
Hin dijîn bi qelama kes nabînin di ser xwera
Hin dijîn di kêfêda hin dijîn bi gef gura
Bi vê rengî derbas dibe reş û sipî bi hev dira

Institut kurde de Paris

# Vê ebretê rake ji min

Heya kengî tu têrnabî ji va jîna reş û tarî

Kanî mûsa ka suleyman giya barkir ji vî warî

İnsan bi xwe wek gulaye temen nagihê hezarî

Pazde roja gul vedibin xwe dibînin ser wî darî

Pêş û paşya her tiştekî tunebûne bi yek carî

Vê ebretê ji min rake talya temen gora tarî

Institut kurde de Paris

# Parê welat perweriyê

# Evîna welat

Institut Kurde de Paris

# Xewna dil

Ey welat ez can fidayê deşt û zozanê teme
Can fidayê av û çema gelî û newalê tem
Her dibînim ez kurdekî dilê min pê şa dibê
Bervê di here û dibezê aşiqê mêrê teme

Li ser axa te me kişand bi hevdira pir cefa
Va cîhana li ne mayî ne tu zewq û tu sefa
Kengî emê te xelas kin  li bin desta bi cefa
Wê rojê emê bi eydkin lêxin bi saz û defa

Agirê şoreşa kurda vêketî li şerq û şemal
Ronî dayî deşt û î çiya li kurdistana pir delal
Li ser rêka berxwedanê pir dihin dost û heval
Bûn çiraxê pozê çiya camêr bûn ronya zelal

Hey dilo mila webê mila webê
Eşq û evîna kurdistanê ket kezebê
Coka xwînê tev evînê ji dil dizê û der dibê
Pir çetine ji vir û hada can û gewde ji hev bibê

Bi heyrana xortê delal tev li emrê xweyî ciwan
Kiriye sitêrka ezmana rijand ji bo kurdistan
Bîranîna wî bimînê tim hebê li nav kurdan
Li ser lêva tim bimînê çi bigrê li dem û dewran

Institut kurde de Paris

Kela diyarbekra rengîn çi şêrîne li kûşa dil
Tev bi seraye û qonaxe  bo bexçeye dor bi gul
Keç û bûkê çayê garî bejin zirav çav bi kil
Li perê wî çayî dimeşin şax berdane oza dil

Institut kurde de Paris

# Sal vegera şehîda

Sal gerî roja we hatî li ber çavêm bû xumam
Roja cangorê kurdaye şazdê adarê temam
Pel weşîn ji pîkê dara di axê da dar diman
Bi destê sedam çû wêran bû bi hezara mal neman

Xwîna şehîda tev zêre kurda pê dîrok danî
Li pelg û pirtûk û deftera sed hezar neqiş danî
Rabe tu bixwîne seke kê hêndêva xwe danî
Kir diyarî kurdistanê serê xwe ji bo wê danî

Ka mergirêta aşûrî sitêra bi şewq û şemal
Kanî mehmûdê şengalî ka wezîr nafiz celal
Kanî idrîs kanî luqman ka qasimloyê delal
Kanî qadî tekê îsa rû wek hêva pir zelal

Institut kurde de Paris

Dîroka şoreşa kurda nalîn û der û xeme
Şer û ceng û tim kuştine xwîn meşî te digo çeme
kurdistan nîşana kurd bû kurda di go bi te heme
lê davê dujmina pir bû ereb heval eceme

kutkê şehîda fereye qamûsik pelik pire
navê keç û kurê kurda ma têdabê hew pire
rû bi rûye di kevê ser hev arê wa şêra gurre
heya kurdistan bin dest bê ruhê me jêre hure

ax ji bo te ey welato tu tim jar û bindestî
çar yalê te tim neyare dav û kemend rêxistî
barê te zor û girane serxwebûn û serbestî
dil bi kul û bi birînim her dibînim tu westî

Institut kurde de Paris

# Serxwebûn

Milet tevda pêt û agire
Burkan û şoreş gurgure
Alav hilhatî giştî ezmana
Lêmişt herikî li ça û zozana
Hîm û pelekê erdê felstîn
Di dest miletda ol û îmane
Hember neyara pêşa we derket
Dengê wa rabû bi ber ezmîn ket
Ra li ezmana bi guhê xudê ket
Alem dibînê tev bi hevdû ke
Nema ditirsin ji tang û topan
Sîngê xwe dane birq û birûskan
Rêka azadî ji wanre nîşane
Dengê va şêra girtî ezmane
Ji jêr û jor da tevda bê kêfin
Şemûn sersenge bi serda deyan
Va şeş mehene pêt û agire
Tarîx di bêje şoreş kevire
Zincîra zulmê li ser çir çire
Tu şûr û xencer kevir nabire

Institut kurde de Paris

Rake ebretê êqil bigire
Doza mileta qet venamire
Hecî ko herê li pê miraza
Mirin pê xwaşe li dunyê çêtire
Carkê tu seke li vêtnam û kûba
Çû wa şikandin diranê gure
Zoyê şoreşa li ezmanê bilind
Di rojhilat da çira û fener
Rakir hevala bi zendê polatî
Çiraxa heqê şewqa xwe pire
Me dest daye hev bi dilovanî
Filestîn di dilda her tim hazire
Doza filestîn doza kurdistan
Ezê sûnd bixum na para gure
Zêrzebî û zindan kêndira dujmin
Qelem tu dîne derew û vire
Seke cezayir çû bûye dewlet
Zimanê neyar tu pê bi bire
Sed û çel sale li bin desta bûn
Hîro di ezmûnda ispirê hure
Milet namirê milet namirin
Were biminra tu we bi fikire

Institut kurde de Paris

# Welatê kurda

Welatê kurda pir şêrîne tev xêr û bêre
Axa te mihrabe ji mera mizgeft û dêre
Tiberka bav û kala textê mala bedirxan
Ûmîda dilê seîd û qadî şahê li barzan
Axa te zîv û zêre cewher û dur û mircan

# Welato

Te nadim bi fatima salih axa kulîlka serê şaxa
Te nadim bi edûla millî sîsina rezan û baxa
Te nadim bi cîbûna kulan êşek û derd û daxa
Te nadim bi zilîfa zeng bi çîn bi husênê zeng zêrî
Te nadim bi xeca maman bi siyamend bi têliya por bi têlî
Te nadim bi cebeliyê mîrê hekara xwedanê xencera zêrî
Welatê kurda ciyê şêran û merda
Axîna dilê keçan û bûkan rîhana rinda
Taca serê bêrîvana xemla wa lewenda
Omîda jar û sefîla şahiya serê govenda
Buhişta hor û periya  bexçê rîhan û kulîlka
Ava zelal xuşxuşa çem û kaniya dengê çivîka
Welato rabûm ji xewa şêrîn dunya buhare
Berf dihelê li ser darê dadikevê li pîka

Institut kurde de Paris

# Kurdistana birîndar

Şop û rêka me xwîne serê xwe em danîn
Em li vê rêkê nagerin kêfa dila nabînin
Heya narînê nebin çeka ji xwe danînin
Kurdistana birîndar dil ji bo te birînin
Li ser me heqe heyfa te gişte bi hevra hilînin
Tu xatûna çav reşe nikanin bê te rûnin
Tu ji mere zîn û eyşe xema ji bo te dikşînin
Tu bêrîvan û binefşe xeca gerden bi xwîne
Dunya li ber me reşe île emê bi te gînin
niha em bê xwedanin bê te em xwe nabînin
bê malî pir çetine sêwî bê mal namînin
seba te em surgûnin aşiq bi hev şêrînin
destê xwe bi destê mede sêfîl bi te zengînin
hevalî bi tera rinde rojê te tev rengînin

Institut kurde de Paris

# Suriye

Suriye erdê me gişta kurd û ereb birane
Şam ji mera paytexte xweş û rind û ciwane

Em ji erdê şamêne warê meye ji kevnar
Pambik dede nîvane ji mere bûye şûnwar

Li cem camya emewiya li ber minara nav zirav
Raket sultanê kurda dan hev di erdê herdû çav

Beyandûr û meyselûn bi hevdira hew xakin
Tey û şêxan û gabar li cezîrê birakin

Roja hatî firensa çete rabûn li çiyê
Bax û bistanê şamê bû meydana me giya

Institut kurde de Paris

# Rêçe nasê miletê kurd

Rêçe nasê miletê kurd tevda jîr û zanene
Ne jiwan bê kes nizane li dunyayê em hene
Di şeva tarî wekê mûma dişewitin ji bo mene
Pir li ceme hew buhane hew ruh û canê mene

Mane qadî bi darxistin li çar çira wek çira
Di zindana reş û tarî mezlûm vêket ma ji xwera
Şêr û piling me dan xelat ji keçan û ji kura
Bavê şehîda berzanî guh neda gef û gurra

Di vê erdê me pir dane şêr û camêr û egîd
Kanî yad û ka tûjû beg kanî kalê şêx seîd
Ka mehmûd û mele awa ka rêzgar û ka cemşîd
Sed goran ji bo kurdistan ji peyan me dan şehîd

Kurd qet yara xwe nafroşe ne buha û ne arzan
Erdê gul û entebûka deşt û çiya û zozan
Min ji dilî xwera kirî yara xwe dîn û îman
Kurdistan îmana meye nayê ber dila guman

Tim buhare li çar dema şax li dara di bişkivin
Çîçek û kulîlkên narîn ji gupika derdikevin
Ava gelî û newala ji jorda da dikevin
Bax û bistana av di din çem ji wa bi hev dikevin

Institut kurde de Paris

Mane buhişte welatim ji we pirs dikim ma çiye
Xulxula mêrg û kaniya dor bi qewaq û biye
Sêzinta ava geliya tev hev dibin kaniye
Ba diweşe li dara dixe xaş dibê me ser siye

Dengê bilbila li pîka tê guhê min siba zû
Veda şifaqê di şerqîda kew û mûrî dixwînin zû
Pê em ji xewê rabûne dinalin bi hevra co
Têrêjên rojê dan dunê vedigerin ji niva zû

Xaşe buhara li kurdistan ro dakete di ser cara
Bi banî ket goga zêrîn têrêj dane zinara
Germik û deşt tev xemilîn kesk bûne pelê dara
Kurdistan welatê meye jibîr nakin tucara

Axa pîroz û mubarek zîv û zêre bi kara
Pencikê bi xwera hilînê hîn tu saxe li wa wara
Tuberka bav û kalaye bîna wa dost û yara
Bîna emberê di têye ji pêsîr û sîngê yara

Ne ayetin ji quranê me xandine li ezber
Bîngol û cezîra botan me dane hev der bi der
Ji vî zimanî me peydekir keske nûrek sor û zer
Di ser welatra xudê hilda di ezmînra ser bi ser

Institut kurde de Paris

Çiqa bêjim herf û bêtan kêm nabê eşq û evîn
Kul û keder tev belane li dor dilê min civîn
Xema şaxê xwe berdane di nîvê dil de bûne şîn
Her dibînim kurdistanê dil melûl û dil birîn

Ji çavê qumriya dinalim ji dest tîrê zerveşan
Ji du biriya te avêtin kîpirê bi nav û şan
Derba te ket li kezebê ji hev cida kir dil û can
Bûme şehîdê welata bila tu xweş bê kurdistan

Institut kurde de Paris

# Kurdistana rengîn

Zanim tu rind û ciwanî dêm gulî û esmer
Herdû biriyê te tarîne bijank tîr û xencere
Xêre dêmê te guhertî rengê te bûye zere
İlet û cewr û cefayan tu istand ser bi ser

Ça û zozanê te rengîne me çandîne tev di dil
Ji bo xatrê deşt û çiya me rijandî xwîna dil
Kanî zekiya çav belek şêrîna bejin fodil
Çav dan hevdû di axêda mir ji bo wê keserê

Ger welatê me tunebê emê bin dest bimînin
Li jiyanê şev û rokê gavikê nikan rûnin
Tirbak xwe em bi kolin bi pera em têda rûnin
Welat dergûş û him gore hew bihaye ji xuserê

Têr û tivîrê dunyayê gî bi welatin li dera
Ji welatê xwe hezdikin ne ji bo milk û pera
Axa hew jî bûne peyda tayî nadin bi zêra
Va tişta hatiye çandin pir ji mêje ji nxweber

Institut kurde de Paris

Axîn dikim ez dinalim ne ji bo kulan û derda
Kurd sêfîl û pergendene perçebûne bi serda
Dest dujmin pê dilîzê têne kuştin di kerda
Ubretik xwe na girine tirsa mine wê herê

Kurdistan welatê meye tim bi nalîn û gazî
Soz û peyman camêra da ger tu çi ji me bi xazî
Bila tebaya te bê lê bes tu li me bibe razî
Xwîna dilê me arzane ji bo xatirê te gewrê

Ne bes navê te bilindbê tê bilindbê li dera
Xuya te xaş û şêrîn bê tişt tuneye di sera
Ger tu camêr û rindbê bidê ser milk û pera
Kurdistana me azadbê ser bi xwebê li gî derê

Institut Kurde de Paris

## Li ser çiya tim keleşim

Cerkî ji ezel te kurd dane li ser çiya tim keleşin
Li serê sala tim qurbanin wekê pela diweşin
Alem tevda hîro zanin em sêfîl û qeder reşin
Xêre hana tu li me dikê em ne pênc û ne şeşin

Madem dilê me ji polête em bi halê xwe nahisin
Ji kewsera te me vexwarî kurmanc hesîn hew neweşin
Xwîna dilê me li pêla reng fitilî şeva reşin
Axîn dikin bi xwînêra bi buxnaqa vedirşin

Xelk dendikê bi zimana te tim devê me girtiye
Li çol û çiya li yabana va mileta tim birçiye
Pere tine bê çar û jar siya dara qe nediye
Ka xasteka te kê bide zar û şûnda vegerîye

Carkê binêr li me kurda çiqa xwîna me rijîye
Heta gengî emê webin tê bidê me azadîye
Nanê xelkê te kir genim bes bi tenê nan garise
Veger tune ji vê rêkê me dermanê kula diye

Institut kurde de Paris

# Darbesta şehîda

Rakin darbesta xortên ciwan li ser milê xwe dînin
Hêdî hêdî berê xwe bidin goristanê yawaş yawaş wî dînin
Alekê ji mala kurda kesk û sor û rengîn lê bi alînin
Baqê sor gula dehla û giliya bi xwera hûn wînin
E ndî benda we dima ey kurdino dora tirbê wî pê bi xemlînin
Hêve ronya çavê meye can fidayê welate li me heqe pak hilînin

Şop û rêka me xwîne          ji vê rêkê nagerin
Canê xwe emê bidin          ji vê rêkê nagerin
Kurdistanê ger nebin          em li mirinê nagerin
De here here de here          ronya çavê min here
Ji dunyayê te barkir          ji bîra me nayê dere
Çiqa me dan bi rêda          şêrê wek zêrê zere
Kanî şêrê li berzan          bi xencer û şeşbere
Kanî doxanê xedar          di taca meda cewhere
Xwendayê jîr û zana          bi qelem û deftere

Institut kurde de Paris

# Kurd hildabûn rûyê dara

Bîst û pêncê hizêran    kurd hildabûn ruyê dara
Li amedê diyar bekir    seîd kuştin li ber minara
Bîst û pêncê hizêranê    rojek reşe ji kurdara
Ala rengîn ji dil dînin    dinav xweda li pêş neyar
Herin secdê bi çavê xwe    nimêj bikin wekî ara
Dua bikin ji cergê xwe    ji nav dilda bi axara
Ro bi derket li koşa dunê    şewqa xwe da di ser çara
Çel û neh mirovên kurd    neyar hildan ruyê dara
Fûad begê rû minewer    vêket hewa wek minara
Bi deng û banga hewarkir    li deşt û çiya li zinara
Ey kurdino di bendî weme    ji bîr nekin xwîn vexara
Hêvî darim her tim ji we    hûn nemînin di bin dara
Turka xwîna dilê me mêt    ji bo va kevir û va zinara
Zarokê me sêwî hiştin    xerab malin ber dîwara
Heya naka dibên bavo    bi kevr û bena bi latara
Bi xwedê sûndê bixum    nabim bira bi turkara
Xwîna dilê xwe nakim av    xilat nadim ez neyara
heya li vê dunyê saxbim    ezê bigrîm li ser yara
berê bimrim herim gorê    ezê têxim guhê yara
bila tucar ji bîr nekin    ref û koma çêl û çara
çavê dujmin li axa meye    biyan basî bi dubara
rabin serxwe wek pilinga    desta bidin çek û kara
temar û xew bese ji mera    pişta me ket di bin bara
mila bidin hûn milê hev    guha medin mişk û mara
welat hemî jiyan dibin    bi çekdarî xwîna yara

Institut kurde de Paris

# Helebçe

Şazdê azarê helebçe bû şehîda kurdistan
Li beyana siba zû kir hewar û qîr û fîxan
Ji kurdara te çêkirî derd û êşeka giran
Tu nîşanek pir mezinbû li me hayî kir cîhan

Ya îlahî biner jorda ma tu bi çav nabînê
Kurd xerq bûne di behrade çûn bi lêmişta xwînê
Cangor pirin bi hezara kes nikane hilînê
Bajar tevde bûn goristan wer limin û vê birînê

Kes nikanê teamil bikê barê kurda hilînê
Şîn û şahî hinda bûye nalîn dakete şûnê
Dilo bi kal û nale li ser derd û birînê
Xem û derdê me civîne ya rebî kes nebînê

Qesr û qonaxê me û ava xerakirin bûn xerab
Rih û rîçalê me hilkirin ji binî jîn bû serab
Tevde em dan ber mirinê bê guneh û xta û sewab
Emin mezlûmê vê dinê bê sûc û xeta û sewab

Institut kurde de Paris

Ya rebî li cîhanê tevda kes vê zulmê nebînê
Ne ji sovyêt û emrîka ne ji hind û ji çînê
Barê me hîro ketiye kes nikanê hilînê
Ma te em dane ser vê axê ibreta ser mêzînê

Hatim mehkema te şahî dendikim ji ber kurda
Rê û yolaqê me qutin dest û lingê me di benda
Ê wekê me pir gerîne pê şikîne di binda
Çare nedîn li alemê derman nedîn bo derda
Bes omîda me tu mayî hatin deryê te xweda

Bes em ê êş û derdane parê me mirin û ta
Ê xelkê berf û barane para me talaz û ba
Bigir doxrî edaletê gilî nema li mehkema
Dad û meded ya îlahî ê teye mîzan û ta
Hatim cemte gilî dikim ezim şairê kurda

Tuye şahê vê alemê bante dikê alem tev
Êşê sedam bi serê me kir kes nakê bi serê hev
Çar hezar gundê me kurda wî xerakir li pê hev
Me hewara xwe anî te bidê serhev û berhev
Tu vê zulmê li ser me rake bila hal werê berhev
Belkî bîna te em bînkin subhanelah bêjin tev

Institut kurde de Paris

# Bîst û yekê avdarê

Bîst û yekê avdarê gul nîşana buharê
Sersala me kurdaye tu bi xêr hatî lê yar

Kawa şêrê kurdaye anî rojek buhaye
Hew roja azadiye xilat ji wîda maye

Gul û çîçek derketin keç û xort bi rêketin
Berê xwe dan seyranê mêr û jin bi navketin

Bi vebûna va gula şahî ketiya dila
Def û dîlan digerê xemilî ji çav kila

Institut kurde de Paris

# Raperîn û serhildan

Raperîn û serhildan çêbû di meha avdarê
Milet malê xwe berdan di despêka buharê

Vêketin bi çol û çiyan baran li ser dibarê
Kurmanc bê nan û dane qet ji bîra me narê

Pozê çiya pir sare berf û pûka êvarê
Kevra ji hev di şelîne çû bi îşin li bin darê

Bê mal û nivîn û cî milet di xewve narê
Can tazî û zik birçî dil bi tirse vê carê

Hawar kirî alemê kes natiye hawarê
Dengê xwe çû cîhanê kes guh nadê hewarê

Ji misrê ta bi îranê kes tuneye musilman
Sed hezar xudan heye gî xudan ol û îman

Miletek têye kuştin dikêye ax û eman
Li ber topa qurbane kes deng nake bi ziman

Kanî koma mirovan zulma neyar hîn reşe
Kurd ji bo azadiyê sêfîl û bext ne geşe

Derdê xwe dikişîne li ser çiya keleşe
Bawer nakê tu tiştî ji vir û hada zik reşe

Institut kurde de Paris

# Kurdistana sor û zer

Tu welatê min tinene ji xeyrî xaka te şêrîn
Kurdewarim ji evîna te ez bûme har û dîn
Ger li cîhanê tu ji minra bûye zîna pir çeleng
Ezim memê wa bejna te li dil vebûne sed birîn

Tuye awê dilo û ciger bi şev bi ro berdewam
Geh dinalim geh dikalim ji hinavêm tê lorîn
Her sitêrek te dibînim geşbû li ezmanê bilind
Ji wê çirisê can bi min tê nuva dibim kesk û şîn

Eşq û evîna welat qet nakim ticar heram
Rêya kurdistanê ji minra her tim bûye ol û dîn
Hespê neyara tucarî qet nakê şahsiwar
Tê peyade li cih bimînê dil bi qehr û xem û kîn

Li ser lingê xwe tu rabe dest mavêje tu kesî
Li hêla çûgê xwe emanke barê giran
Çiqa sal dem derbazbin aşê neyar digerê
Arê wî ji xwîna meye vê koletyê bi civlîn

Tu çûye kuda jibîr meke kurdistanê sor û zer
Bik beramber bi dilê xwera va welatê xak şêrîn

Institut kurde de Paris

# Agirê şoreşê

Agirê şoreşê vêketî li çiya
Şewqa xwe daye kurmanca giya
Dûr û nêzîk tê ji meva xuya
Dê werin werin kurdîno werin
Bi mêranî rabin em tevde herin

Şer li kurdistan hîro girane
Dengê me girtî erd û ezmane
Serhildan ji mera hew dil û cane
Dê werin werin kurdîno werin
Bi mêranî rabin em tevde herin

Axa kurdistan li bin desta mayî
Bi xwîna dilê xwe me pir avdayî
Êstêrk rijîne li ezmanê sayî
Dê werin werin kurdîno werin
Ser rêya mêra em tevde herin

Lorîn û nalîn nabin ji mera
Xwedê mêr dane ji bona şera
Bin destî nabê qeder ji mera
Dê werin werin kurdîno werin
Li ser rêka şêra em tevde herin

Institut kurde de Paris

Bajar û gunda serê xwe hilda
Evîna welat şînbû di dilda
Keç û xortê me ji ciger û dilda
Bûne pêşmerge dê werin werin
Wek refê şêra li dujmin bigerin

Mebêjin hîro rêka me kaşe
Bi kevr û zinare bi hîm û daşe
Hilkişin cûdî bîna xwe xaşe
Dê werin werin kurdîno werin
Desta bi hevdin em tevda herin

Dahola cengê ro bo ro lêxînin
Welat perwera pê bi civînin
kom bibin ser hev soza xwe dînin
Dê werin werin em li hev runin
Li ser rêka mêra em tevda herin

Institut kurde de Paris

# Xortê welat

Ji bo xatrê vî welatî em di xwazin serxwebûn
Berxwedan rêka kurdaye ya hebûn ya tinebûn
Tok û ber bendan qetînin yek car divê ser hişkbûn
Koletî nabe ji mera bijî bijî kurdistan
Emin xortê vî welatî di dest medane çirax
Giştî em şêr û pilingin can fîdane bi canê sax
Rêça qadî em bernadin çiqa herin dem û çax
Azadî armanca meye bijî bijî kurdistan
Bax û bistanê welatême buhiştin ji mera
Xuşxuşa mêrg û kaniya di bin dara û bera
Ava te nadim bi zemzem ne bi zêran û pera
Xewna çavê me kurdaye çiqa bigerin li dera
Emin xortê vî welatî li pê hevdû  di hen sef
Destikî me qelem têda mil me dane milê hev
Tuye ronya çavê kurda çiqa herin roj û şev
Bi yek dengî em bandikin bijî bijî kurdistan

Institut kurde de Paris

## Can gorê welat

ey şehîdê kurdistanê em hatina şînê te
Canê te firî ezmana li vir mayî gewdê te
Bîranîna te pêwiste em şîn bikin agrê te
Tuye ruhê vî miletî serbilinde hew bi te
Qet miletê me kurda wenda nakê navê te
Tu bîn xweşka ber dilaye bîna xweş tê ji bejnê te

Navê te navkî ezîze tu buhaye li gî dera
Her miletek li te hezdike te nadê bi zîv û pera
Tu camêre bi her tiştî rih diyare ji mera
Te canê xwe fîdakirî kir ronahî da dera
Axa kurd û kurdistanê bû cil û kinç ji tera
Xweke tu çavê xwe bi hevde bijî bijî ey bira

Hatim mala we şûna te milet civîye li hev
Gî deng dikin wa şûna te yek gotina dikê bi dev
Pesna te dayî bi camêrî rind bîna te dibe tev
Tu ji mere ruh û cane rêber û ronî û çev
Em te nadin bi koma pera çiqa kombin li ser hev
Tu li ba dilê me buhaye hêva li bane ger tê şev

Institut kurde de Paris

Xort û keçê sîng hildaye hatin mala we bi ref
Dest rakirin li dû hevdû rêz bi rêz û sef bi sef
Gotin tu tim hebî şehîd ji dil û can ne bi dev
Ey nîşana berxwedanê taca bi rûmet û şeref
Rehma xwedê li gora tebe tim bibarê li pê hev
Bijî bijî tu ey şehîd bimre dujmin birjê çav

Institut kurde de Paris

# Aşiqim çiya

Tu li min pirsdike eceb ma kîme
Ji kuva hatim ji kî ma bûme
Rêka min çiye ji çi alîme
Bi kîra dostim ji kî partîme

Aştî xazim ji cengê natirsim
E can erzanim ji mirnê na pirsim
Ol û dînê min kurd û kurdistan
Canêm ne tuşte ez pêşmergrme

Hatim sitiran ji axa çiya
Ez bav kurmancim wena têm xiya
Diya min kurde ji mêrg û kaniya
Min têr vexwarî lê hîn etîme

Xezolak hêşîn dil xwestî ji min
Çiqa saline mayê li benda min
Destêm nagînê hawara li min
Li ser zozana aşiqê wême

Rengê perzera aşiqim çiya
Talyê buharê etêm lê xuya
Çavê min girtî tev gul û geya
Gava dixwînim zimanê wîme

Institut kurde de Paris

Mêrxas û egîd pir ji me hene
Xwe ji wara xarkin hewna ji mene
Kê dibî zana ji me tunene
Mele osteye şaxik ji wîme

Kê sitemkarbê jêra neyarim
Hecî xwîn vexar ejêra barim
Qanûnik dirist e li vir dixazim
Yanbasî her tim ji minra dujmine

Ser govendîme govend min girtî
Dîlanek şêrîn dilê min girtî
Çar perçe kezeb neyara girtî
Kengî şahiyê dil bi xemlîne

Rêka min çi bê ji kurda nagerim
Ger dawdîbim welat perwerim
Ger ez sofîbim dîsa ez kurdim
Laleş hecîbê disa ji weme

Rihêm digerê li cem cotkara
Çikim lê xistin refê fiqara
Hew çûn û hatin bi eşqa yara
Dilê wî pake qurbana wîme

Institut Kurde de Paris

Xwedê daye me zarê kurmancî
Dame kurdistan ji mera kir cî
Dijmin dibînê li me vî sûcî
Em ji kawane kurd tev ji wîne

Sifîl û zelal mane wek çira
Karkir û cotkar bi mera bira
Kî ger birçîbe surgûnbe li dera
Ji wîre dostim hevalê wîme

Institut kurde de Paris

# Keça kurdî

Keça kurdî de zû bixwîn wek moriya li ser bena
Serê sibê bi qebqebke li ser zinara li ber kelema

Du sid awaz bi dengê narîn bela bike li deşt û çema
Guhdar bike dilê kosî çi dibêjê ji derd û xema

Perde bûne kela hêsin xelk şiyarin di va dema
Rabe serxwe bidirîne tu dûrkeva ji derd û xema

Ma ne bese çarsid salin tu bêrîvan li zozana
Xelk firiya çûn ser hîvê tu sêwiye li ber serma

Institut kurde de Paris

# Bajarê şehîda helebça

Hey larê larê delal şêrînê
Bejin ziravê hey xem revînê
Ma kî ne hesî bi wê birînê
Kezeb şewitî dil ketî şînê
Ji çavê me têne rondikê xwînê
Kes vê xişimê ya reb nebînê
Hey larê larê li te narînê
Em ax dikine ji vê birînê

Li ser te girtin hev zoyê dîwala
Tu li hev parkirin tev milk û mala
Hêf li zarok û li xort û kala
Devê xwe dane sîngê kendala
Vemrîn bi carek çavê xezala
Derdê me pirin nakevin çala
Ji nûve çênabin bi meh û sala
ço ne lorînim li ser camêra
we nekim şiyar û nekim hevala

me xwe hazirkir ji bo cejn û îda
ser sala reş hat hêf li egîda
alem tev kerbû gava tu nalî
reşî me li xwekir bi sala girêda
sipî me firot bi rengî tarîda
sitêr ziyabûn bes dil dinalê
nikan jibîrkin koma şehîda

Institut kurde de Paris

xêre alemê xwe ker û lal kir
parîs û london li ser te xwe kir
ma kê ji wana dengê te ne kir
li ser hejara kesî deng ne kir
ne ziman gerî ne zara deng kir
bi xewa mirinê wa li ser xwe kir
xêre li alemê ger yek tê kuştin
parîs û london mosko û waşinton

li ser deng dikin bi roj û şeva
yêzge dicûnin bi dev û lêva
roja me kurda qulbî delava
haqa sitêrkê me çûne ava
ne livî li kesî bijangê çava
kevir nemane mîraba dînin
ziyab bûne li me kanîkê çava

me ji te hezkir me tu nas nekir
berî te bînin me bîra te kir
li bakurê îraq nalîna te kir
daxek turfende te li dila vekir
kanya kovan û kula te derkir
xêre li alemê ger yek tê kuştn
parîs û london mosko û waşinton
bi roj û şeva li ser dengdikin
ji ber ko bê çarin em pir sivikin
em bê xwedanin li me we di kin

Institut kurde de Paris

kê ji va paytexta dostê kurdaye
heval û hogirê belengazaye
di roja tengda kes ne xiyaye
barê me girane wekê çiyaye

kanî îslam û kanî biratî
kanî pêşketin ka dîmuqratî
bêtara giran bi serê me hatî
me li jor gilî kir xelkê raketî

sazmana gelan çavê xwe kore
him ker û lale dilê xwe ketî
hîro em dûrinji zar û zimana
em hatin jimar ji koma însana

helebçe nizam ma te çi xarî
zulim te kirî pir guneh karî
bayê mirinê te hilkişandî
zihêr û wîran li ser te barî

berî tu şabê bi dema buharê
gulîk çilmisîn bûn ustê xarî
dilo bi lorîn li te bi çarî
ne li merêkê li heft hezarî

li xort û kala li haqa zarî
devê xwe dane mirina tarî
xweda tu rake li ser me vî barî
kurd bê xwedanin kê ji mera yarî

Institut kurde de Paris

va me girêda li ser şaxê te
refê sîmexan refê bazên te
pê me xemlandî gir û çayê te
rihê xwe bi erzan me da ji bo te

dil xwazê welat li me guh darkin
berê xwe bi hevdin xwe ji hevra bi çakin
xewarê kurda ji xewê rakin
pêşmerga bi rêxin barê me rakin

Institut kurde de Paris

# parê

# Navdarên kurda

# Û

# Lorandin

Institut kurde de Paris

# Bîranîna serok berzanî

Serê xwe rake temaşakim li ber kêla kevirî binêrim
Li şax û giran li deşt û çiyan li kurdistan şahê kurda
Binêr berzan binêr zaxo binêr xaneqîn û hewlêrê
Bîranîna te şîn kirin hîn tu xwaşe li nav merda
Milet derket tev ji mala kes nemayî ji pîr û kala
Giştik kombûn li hewlêrê himêza wê nema vala
Serê xwe rake ji gora tarî carkê binêr li hevala
Bîranîna te kirin cejn mîna newroz û sersala
Kurdistana te meşî tev li pê hevdê gî rêz û sef
Xemilandin bi dil şadî meşîn gel hev wekê yara
Şan û navê te tev gotin bijî berzan û kurdistan
Bijî ey rêberê kurda ne carekê milyon cara

Tu ye bîna buhara me tu ye perwana eşqa me
tuye ronya roya delal di tê hêdî di ser çara
li ser soz û peymana te me sond xarî hezar carî
em bernadin axa zêrîn bi me şêrîne hev gul yara
kurd nafroşê qet yara xwe bi tu nerxî biha herzan
gişt raperîn gund û bajar çol û yaban di azara
yara kurda kurdistane hew ji mere rih û cane
gel te helbijart ji dil û can te li ser xwe kirin serdar
jiyana te berxwedan bû vê rastiyê cîhan zanê
hey dubirakê bena bilind mal te ne girt li ser dara
te jiyana xwe derbazkir bi xebat û ceng û şera
evîn te çand di dil meda kinkir omrê sitemkara

Institut kurde de Paris

te pir kişand germ û serma heya navê te bi derket
ezman vebû li pêşa te têra diçû wek teyara
xanyê te yê di ser bin hevra kurmanc vêra di bin altust
bi merdewan tu hildikiştî dayî  dengê qesra dara
bayê rojava bîn dikir li ser kanî û mêrgê berzan
bi wî bayî tu mezin bû serî hilda wek çinara
her tim şîne dewsa şêra vala nabê ji camêra
idrîsê canmerg barkir keser çûne mane vêra
dara berzan her tim şîne bixwîne tim di bê geş geş
mesûd maye xilta te radikêye li serme bara
miltê kurd tev pêştmêre tev fidayê rêkateye
qet namirê ûcaxê te bi zirx û top û teyara
agirê berzan her tim geşe bela dike şeva reşe
ji kurdara cîh û ware  pêt û doje li neyara

Institut kurde de Paris

# Rêberebi nav û nîşan

Pîre merdê şer û cenga nav zirav cinaq liheng
Serê te giştî ezmana li ser çiya te danî ling
Nobedar û esker civîn bi tera kirine ceng
Temenê ciwan derbazbû di wa rojê tarî û teng
Bi mêranî te vexarî nav û nîşanin bi deng
Wek li royê te xal reş tu di dîroka me bo deng

Herb û şerê te giranin bela dikin nûçevan
Qutbê jurê li cîhanê bihistî dangê kurdistan
Gava tu hat li gulanê li dor te çend xort ciwan
Pêşmerge bûn ji kevnarda can fîda canik erzan
Şoreşa kurdî te rakir ser ji nûva kirî can
Sêwî hebûn li ber dîwara tu jêre di bû xwedan

Ger tu ronê li kuderê wir mezine bi navê te
Pir cih û war me nizanî bûn hevalê navê te
Balûs û gelyê balinda dest pêka geryana te
Hew sulave li amedêke şabûye bi hatina te
Bajar û gundî daketin bes bibînin bejna te

Institut kurde de Paris

Ne tu bes nasî li nav me        li cîhanê seranser
Bi gerîna te li orupa        dewlet şabûn kûm û fer
Dergehê qesr û qunaxa        herdû yal bûne esker
Li silava te rawestan        qor bi qor û ber bi ber
Ber li pêşa te raxistin        tu di sera çû biser
Mêcer û mêtêran rabûn        hatin rûyê te ji xweber

Navê te navkî mezine        nikam bêjim bi ziman
Tu şanik li royê çerxê        tu ji malek xanedan
Dare tu ji bûyê geşe        li ezmana şax vedan
Ey msûd lawê berzanî        tu ronaka kurdistan
Tu ji mera dil û cane        rêberê bi nav û nîşan

Bi husin û cemal û edebe        mêrxasekî dîrokiye
Dêm gulover û minewer        rû bi şana xemiliye
Kê te dibîne pesindare        tu bi şerm û fediye
Li tîr mahê ji dostara        ave sar û kaniye
Tu qunaxek pir bilinde        eywanek bi cil û cîye
Tu xudanê nîvanaye        bi dil derya sipîye

Serê kurda bi te bilinde        tu li kuderê ger rûnê
Natê ronya tu sitêra        hêv dakevê ger şûnê
Ger tu tê serme buhare        zulmê neyar namînê
Tirs ji dila bi dûr dikevê        şûp û hîza xwe namînê
Ey lawê şêr û pilinga        sed lawê te bimînê
Li ser xwe emê bi padîşahkin        bila li ser çava rûnê

Institut kurde de Paris

Hezkirina te dil girtin em bîn dikin bîna te
Gundî û bajar çûk û mezin tên civîna bejna te
Gî radibin bi hevdira sîngê malê didin te
Berî tu silavê bi wandê dest di civin di dest te
Kêm serokê kurda hebin bi camêrya bejna te

Institut kurde de Paris

# Gora serok berzanî

Pesin darê navê teme ger tim saxbim li virê
Gora te kaba kurdaye camêr civîn li dorê
Di rojin tarî û teng da sond dixun bi wê gorê
Em bernadin berxwedanê ger dijmin bikê zorê

Çû dunya heq çend saline te barkirî ji nav me
Gewdê te helî di axê hêstî mane li nav me
Pir sax hene nav windana qet nayêne bîra me
Ê wekî te namirin hil nabin ji dunya me

Ronya ramana te mayî çiqa herin meh û sal
Di pê tere kurd û kurmanc tim dibêjin kanî kal
Ka ew şêrê li ser çiya camêrê bi şapik û şal
Dunya yeke em nîvanin omrê me boş û betal

Institut kurde de Paris

# Tu kuda di herê ey malî ava

Me li te barandî ji herdû çava
Histirê xwînî mîmane tava
Ji histiya hatin camêr û xemgîn
Roja te daket çû ser delava
çû te em hiştin li warê xema
Tu kuda di herê ey malî ava

Şahê kurdistan milet girêda
Reşî li ser te bi dilovanî
Haqa tu gerî kesî nizanî
Tu yê li mihabad bibê nîvanî
Ger bi tiştaba bi keç û xortaba
Meyê di berte biba bi arzanî

Felekê em dan li me nebanî
Mirin qanûne ne di vî zemanî
Rustem û kawa gorgîn ma kanî
Yek yek çûn gora hêvê li banî
Tu jî ma rijî li wî ezmanî
Haware hawar felekê hanî

Institut kurde de Paris

Bê xwedan mane koma eslana
Çek bi dest wada li ser zozana
Te tîmar kirin li çol û yabana
Zendê wa ji polat dim ji rîhana
Bes te biba wa fermana cengê
Qet guh ne didan tu rih û cana

Navê te derket rêka te mayî
Şewqa te heye li ezmanê sayî
Pîmayek giran li şûn te mayî
Dîsa ro bi derket li ser wî çayî
Kê xand liber te te dersik dayî
Heya ko bimrê narê li bîra wî

Derba me kûre ji derba xencerê
feleka neyar çep li me digerê
Dilê me şewtî ne ji xweberê
Navê te daxist kirî defterê
Îmza xwe carkê di binra danî
Karwanê mirinê tu vêra diherê

Berzanî cakê ronya te veda
Şewqa te girtî pozê serheda
 gêlanî bi xwe dengê te neda
sitêrk û palan serê bite hilda
meqam ma çi bûn li vê cîhanê
şêxê kurmanca xurtê egîda

Institut kurde de Paris

tu kaba kurd bû di roja tarî
li hember neyara teraf û arî
çiqa dijmina derb ji te xarî
di meydana herbê şêrê wî warî
turk û ereba furs û çerkeza
silav di dan te bi huste xarî

navê te derket di qirnê bîstan
di roj hilatda tu zulfeqarî
gelyê elî beg ji te hezdike
mustefa berzan zûda nas dike
şengal û zozik li ser te digerin
kurdistan tevde şîna te dike

lorîn û hawar qet çare nakin
helbest û tirêz qet fêde nakin
belekê berfê talya buharê
dilê şewitî qet hûnik nakin
navê te saxe di dila şîne
roja te barkir em jibîr nakim

Institut kurde de Paris

# Kanî şêx muhemed

Hacet heye tu li til marûf        herê bi gerî bêj xwedan
Li ber kaba şêx xiznewî        rokê bi be tu nîvan
Çend murîd li dor te rûnin        hûn bikin reqs û dîlan
Li ber xwedê hûn bigerin        bi hewar qîr û fîxan

Heger tu ne nefs bilinde        li gundê kosa tu bi pirs
Bêje kanî şêx muhemed        ya erîfê bejin girs
Yek mileye bi dîn zanê        nabêje ilmê xwe quriş
Ê din şair û zanaye        cewherê ferd û bê kes

Heq naxwazin ji tu kesî        ne bi meha û ne sal
Em zanin dunya valaye        temen tev boş û betal
Ji xwedê xwe dixwazin        me bikî dost û heval
Navê me bimîne li dûme        li ser me dengkin pîr û kal

Kesik qedrê wan nagirê        pirr civlîne li dera
Guh nadin milkê vê dunê        rez û baxan û pera
Li camêriyê tim digerin        kirin nîşan ji xwera
Xelk û alem wa nas dikê        di şevê reş wek çira

Institut kurde de Paris

# Şîna heval kemal ehmed

Dîsa roja me bû tarî mij û mûran daket çava
Ker û lal em gî rûniştin sêwî ketin dîsa dava
Kurd hatine ser termê te barîn hêstir wekê tava
Matmay mane ji mirinê di gorêda tu çû ava
Çare nedî me ji mirinê gorî tebin zoyê çava

Ma kî zanê ekê rokê bi ser teda bilorînim
Werim şûna te hevalî li ber kêla te ez rûnim
Dost û yara li te kom kim hêstirê çava birjînim
Rojê me borandin bi hevra disa bîra xwe ez wînim

Di pê tera kurda rakir li şûn alê reşî danî
Li roj hilat li roj ava gelê kurda serî danî
Navê mirna te belabû kurdistanê bîraq danî
Xort û cana pîr û kala yek yek qedra te wa zanî
Hatin şûna te camêrî kesî nekir dil giranî

Bilbil çima tu nagirî tu dil şade bi awaza
Bê perde tu têl tu dinalê li pê hevdê deng û saza
Dîsa hîro em xembarin tirbak vebû li sirt û gaza
Çarkî kurda têda raket bi nav û deng ji mêrxasa

Institut kurde de Paris

Ma ey bira tu nahêse birîn kûre birîn reşe
Qefes mala te hogirî cîhan li pîşa me bû reşe
Ji ax û nalîn û fîxana vedirşin xwîna reşe
Keç û bûka li serte girî hêstir barîn ji çavê reşe
Felek li me çep digerî vebû li me bextê reşe

Subhan ji tera yazulcelal te çi çêkir rind û delal
Ka hew camêrî te dayî bi nav û denge husn û cemal
Kanî bavê xalid kanî ka serwerê kurda kemal
Koç barkirî ji nav êlê bû nîvanê şahê celal

Raste bira tu ket axê tu hîn xweşe li va wara
Bidar nemrê gocek nadê erd şîn nabê li dû ticara
Baxê gulê te tev xemilîn şewqa royê da zinara
Şopa rêka te me girtî têra dihen bi eşqa yara
Şopa rêka te a kurde me ji dil hilgirt zoyê bara

Gul xemlîne ji heft renga dor bi gulê kesrewanî
Ey kurdino kî nizane navê berzan di vî zemanî
Bavê xalid te li cem wî xand ilm û zanîn jê hilanî
Bi me şêrînbû axa welat çem û çiya mêrg û kanî
Em tev hatin ser rêka te me dest da te bi mêranî

Institut kurde de Paris

Dilo megirî dilo menal desta rake hêstira vemal
Dîsa şevê me giran bûn dirêj bûne mehe û sal
Heqe li te em bigerin me hindakir dost û heval
Ka camêrê bi husn û edeb ka serwerê kurda kemal

Institut kurde de Paris

# Dayka dilovan

Silav li ser te dayka dilovan

Gî tişt ji bo me te dikir arzan

Emjî nîvanin li vê cîhanê

Wekte rêwîne man bê xwedan

Kanî evîna dilê te û nermî

Dinalê li pê te dilşah û fîdan

Tu bû tiberka bavê me dipêra

Ço te koç danî li axa goran

Sed hezar rehme li hêstiyê te bê

Xwedê te bikê li cinetê nîvan

Institut kurde de Paris

# Bavê min

Mexabin carekdin em te nabînin

Sêwî em mane xema dikşînin

Ji bidarê adem em bone peyda

Him tal û tirşin hinik şêrînin

Weşî pelê te ji dara ecelan

Ronya êstêrka te geş nabînin

Ço me hindakir dilê te û nermî

Hîn ji zarê te bi hesret dimînin

Hîro tu nîvane li xwedayê banî

Em bê çarene ciger bi xwînin

Institut kurde de Paris

# Bavê ehmed horîk

Ey falek nizanim xêre tu bi mera bi dujmanî
Sed kul û derd te civandin di nîvê dil da danî
Te jiyana me reşkirî koç li pişta me danî
Bê nan û avem gerandin me dan hev çol û banî

Kanî hûrîk hew camêra xwedanê bejna bilind
Ka şevgerê deşt û çiya ka hew çayê dor bi gund
Ka peyayê wekê şêra li ber çavê me pir rind
Ketî dava mirina reş li pêşê rêxistin kemend

Here bira hera bira sed oxirbê ji tera
Dil birîn û dil xemgînim ji ber kul û kesera
Şevê rêya me girtîbû tu bû ji mera çira
Ji vir û şûnda ez nakirim vê jiyanê bi pera

Xoçik û bavê me tev mirin kêf ji dilê me firî
Her çend miha dibim nîvan li ber kêla kevirî
Silavê didim hêstiya li heval û hogirê mirî
Bes tê bîra min zarê xaş roja wana koç barkirî

Institut kurde de Paris

Bi vê felekê kes şanabê tim namînê li vira
Berî tu werî vê dunyayê ma tu li kubû ey bira
Ji talmakê tu bi hevdûket tu çênebû bi vira
Guh û çav xwedê dane bike şukra xwe jêra

Çê û xerab ger tu bikê gişte dibê milkê te
Ger tu rindbê têye danîn li rûpelê kutkê te
Qas tûzikê hinda nabê ji hisabê karê te
Veger riya rebê banî hew xwedêyê min û te

Rehma xwedê gelek pire ro bi royê dibarê
Erdê şîn dikê bi avê di xemlînê buharê
Ji her tiştîra xwedaye hew di xelqê xwe narê
Tu omîda xwe me bire rehma wî tim dibarê

Hêv di gerê di banîra mîna goga tê xuyan
Ronya xwe di dê geliya deşt û newal û çiya
Aşiq û maşûqa dipê çû dibin li hevdû nîvan
Surra eşqê hewal nadê hêv hevalê me giya

Institut Kurde de Paris

# Parê

# Helbestên civakî

Institut Kurde de Paris

# Dibistan

Dibistanê de tu veke        deryê xwe va em hatin
Em tirêjê royêne        li erdê te hilhatin
Her rojê hiltê li banî        em radibin ji xewê
Destê yadê maç dikin        tê bîna bayê sibê

Ji kurdistanê em tên        ciyê şêr û egîda
Ji nav şeva reş di tên        welatê wan şehîda
Exlaq û edeb rindin        pê şadibin bav û dê
Em piştgêrê welatin        li welat kêfa me tê

Dibistana me buha        bexçê gul û kulîlka
Ey rîhana li ber dila        ser dinê koma çûka
Em hezdikin bixwînin        zanîn buhayê ji berê
Bi zêra beram bere        qîmeta wê cewherê

Institut kurde de Paris

## Çira vêxin

Çira vêxin li vê malê sire hat ser desmalê

Dê govendê bigerînin ji bo vê çav xezalê

Dê bigerînin govendê seba vê dêm lewendê

Zû birêxin ji mala zave mayî li bendê

Şêrîn gulê bixemlînin xoşik bûkê derînin

Law aşiqê gulêye destê herda bi hev gînin

Dunya bi xwe dewrane dewran siya darane

Zû bi zû bin li cîhanê mirin bi xwe kewrane

Barê zewac adete ji xwedêda rehmete

Li me kurda sinete pak em keça derînin

Institut kurde de Paris

# Jin

Jin xemla malaye
Sebra dilaye bîna gulaye
Roja bilinde
Ronya xwe rinde
Hêva ezmîne
Xûş û şêrîne
Bîna sosina ji sîng di kelê
Ger tu aşiq bê li hember di helê
Ji te bi dor kevê
Tu li hev dişelê
Jin cîhane
Jin jiyane
Ax û amane
Mala ne têda
Tevda wêrane
Ger hew têdebê yayle û zozane

Institut kurde de Paris

# Gula kosa

Gula kosa te dîn kirim ji dil û can û rih kirim
Wekê memê mezlûm kirim bê hal di çala werkirim
Ax ji şala kesrewanê

Du şan ji hingivê şêrîn ji wan lêvên te dibarîn
Nexwaş kirim ez dil birîn tu pêş meke tev dims û rûn
Di çêlede li zivistanî

Bi wan lêva te go sazek giha rihê me awazek
Ji wa bejna teyê nazik me jê hêvîkir daxwazek
Wîsala canê te û canî

Ji wêda hatî hew xanima dilê min çû reqs û sema
Xewn û xeyalê min nema rihêm firî gewdê min ma
Lome kirin bi min kenî

Yara te ger nebê bedew şêrîn nabê razan û xew
Buhar di tê dixwînin kew morî vêra dikine tew
Li ser zinara helbest hûnî

Institut kurde de Paris

Pîrê helbesta serwere cewher firoş û perwere
Bayê wana zêrê zere dil tim kitab û deftere
Helbest perçak ji dil hilanî

Ezim mûsa li çayê tûrê me ar dîbû diçûm dorê
Di nav êrda di nav nûrê ecêb min dî mam li dûrê
Giham pêlik ji wî canî

Ji wê pelê nexweşim ez ji keynarda serxweşim ez
Li du boza rêwî me ez ji wê nûra te dûrim ez
Ya reb me dûrke ji gûmanî

Ewir pirin li ezmana birûsk hiltên li zozana
Nîşana berf û barana hêvî dikim ji te cana
Buhara me bi xêr anî

Institut kurde de Paris

# Gula kosa 2

Ay lê gulê tu gulaminê tu kulîlka dilê minî
Hevala temenê minî tu kebanya malê minî
Ji bexçê kosa min çinî

Gulam sore ci li banî li xeyalê min nîvanî
Di sera çaye gir li banî xem û xeyal û zozanî
Subhanelah çi giranî

Gula kosa te revandim li rûyê dunê te gerandim
Ji te dûrim te helandim ça û zozan min şopandî
Yek der nema me kuç danî

Şubhê şêxê nîşanî ez di lorînim dinalim ez
Ji wa lêvên şekir û gez ji çavê belek nexweşim ez
Zêde ji tîrê zerveşanî

Gulê tuye gula zera bûm şivanê te li şûn peza
çiqa derdê me tê diza tu diket mira bi qereza
ekê bimrim derman kanî

Institut kurde de Paris

gulam şîne kesk û zere        hêş û aqlê min li sere
tu bi zêra beram bere        kurdistana me cewhere
qelenê wê me dil danî

me dil daye bi zirarê        roja serbest bê tu yarê
buhare hew li bîram narê        nalîna min li te kîbarê
li ser kesera meraq anî

berzan make berzan çake        qendîl û zozan û xake
gelê kurda tev birake        mirin yeke mirin cake
bimrin tevda bi mêranî

kurdistan çem û zozane        çi bîn xwaşe çi rîhane
gul buharê me li çane        şengal û êvrisa cane
can ji xweber bi me anî

lê evîna te dil dayê        ketime eşq û sewdayê
şev tariye xewam nayê        bûme mecnûnê leylayê
ji dest êşê vî zemanî

Institut kurde de Paris

# Hefkî diherê di xemilê

Dilê dilê dilê dilê çav belekê çav bi kilê
Sîng kaniye li nav dara va jê dizê dixulxulê

Du zozanê te bilindin zoyê memkê te pir rindin
Ê te dixwazin hemû kurdin li ser pîka bûn bilbilê

Bejna delal wek kulîlka govik rihan di qulpîka
Me xwe dayî ber teltîka ji bo pora li ser milê

Li min dinerê bi awira birû bijang ji xencera
Gava tu tê ber pencera pelesanik di êfilê

Dilê dilê dilîşanê sîng bi morî û mircanê
Em kirin berxê qurbanê hefkî di herê dixemilê

Em helîn wek berfa heda aşiq bûne bi ser teda
Me tu xast û bersiv neda ame li xwedê lê fodilê

Institut kurde de Paris

# Çayê gewir

Li va çiya ez dinêrim çi çiyanî delalin
Sibê bi xerbî û xunavin tev bi kulîlk û alin
Bejin bi merx û qemelaqe tim hêşîne li çar dema
Di rind bûnê mezin bûnê di xemlêda hew kalin

Li te dinêrim tu bilinde ser te mij û morane
Zivistanê tim dikevê li ser te berf û barane
Havînê em têne cem te tu ji mera xweş zozane
Ger bibînim te ji dûrda şadibê her dil û cane

Ro hilatî nû bi derket têrêj dane sor û zer
Li eniya te qelibîn rû û dêmên te gir gewir
Şewqa rojê da bejna te xemilandî ser bi ser
Dil û canê min helandî tu di cigerê minda fer

Pozê te gelek bilinde di ezmînda hilatî
Ewir tim nîvanê tene kêfa wana bi te hatî
Çayê gewir bi ntera dibên va nava li te hatî
Berî em werin cîhanê navê te di kutka hatî

Deşta te deştek fereye tevda bi xêr û bêre
Çem û kaniya xemilandî ava te zîv û zêre
Buharê bi gul û geyaye koçera li ber kir çêre
Canlê olan lê diçêrê ji xêra te di bin têre

Institut kurde de Paris

# Cotarî

Ey cotarî tu rabe zû     sol û bende girêde zû
Dengê çûka li gulzara     tê guhê min va sibê zû
Ro deketî li ser çiya     şewqa xwe dayî geliya
Hele rabe bi dil şadî     berî bide her zeviya
Di xettara her û wer     welatê me zêrê zere
Bi xuya enya xwe tu avde     biçîn bike dar û bera
Şev û rojê bihevgîne     deşt û çiya bi xemlîne
Tu zû darê xwe bigîne     kurdistana me rengîne
Ji vê axê em bûn peyda     jê bûn mela şêx û seyda
Rokê emê xwekin têda     kurdistana me rengîne
Axa kurda tev enbere     war şêrîne zêrê zere
Bi cinetke hîn tu li vire     mal û ava hiya bigre

Institut kurde de Paris

# Camêrî û çekozî

Camêr bûn tacek zêrîne da serê xwe camêra
Bi wê xemlê hew şêrînin ronya xwe dane dera
Hatimê tey û cebelî çûne ava di gora
Yek bi denge nav ereba du hezar sal çûn di sera
Ê din mayî li nav kurda ketî kutib û deftera
Merî cêmêr zêrê zere şor dimeşê li gî dera
Alem tevda jê hezdikê her yek dibê desbira
Mirov çiqa ger zengînbê li dunyê bibe çekoz
Cehnem dîsa qebîl nake pê ranake tucar poz
Ger di mala xweda bimrê li ser bikevê bostek toz
Kes ciyê wî li ci ranakê heger bibê xar û xoz
Kar û barê wî nameşê pênakevin daw û doz
Li civata hindaye kes nabîne wî dil soz
Ger tu zengînbê tu bibe bi malê dunê ramek poz
Li civata bi nav û dengbê gul û çîçek qeregoz

Institut kurde de Paris

## Gundê me

Şairê gulzara kurdim ji du kezya dihûnim
Xewn û xeyalên min pirin nikam li nizma rûnim
Serê sibê bi bilbilra li pozê çiya dixwînim
Li nav kevir û li zinara nêrgizek xwe hiltînim
Dibim bi xwera li xerîbê sebra dilê xwe pê tînim

Bayek dihat di şewqêda ji dil û can şakirim
Êş û xemê min wendabûn e nexaşbûm sax kirim
Rêka kurd û va kurmanca çend saline di nirim
Hatî bayê azadiyê bi dil û can di firim
Ji vir û hada min ne xeme ger bimînim ya bimirim

Bax û bistanê welatim tev ji minra bûn bihuşt
Dil venahese li tu dera li kuderê hew rûnişt
Raheta canê min tuyî bê kul û derdê xwe kuşt
Hilkiştim çûme ezmana bi çavê xwedî bihuşt

Çend saline ji te dûrim destarê omrêm digerê
Têm ziyareta te rokê xem û derdim dihere
Kevr û kuçkê te li xerîbê tim bi minra digerê
Tim hilanîne di dilda dil diherê bi keserê

Ava zelal ji kaniya di herike di tê der
Dadikevê ser newala şadibin pê dar û ber
Di rêya xwera hew av dide wan kulîlkê sor û zer
Bax û bistana şîn dike dixemlîne ji xweber
Av jiyana rih û cane li kuderê were der

Institut kurde de Paris

# Payîz hatî bi ser meda

Heyfa omrê min diburê ro bi ro can diherê
Reşya pora min hindabû omrê min li pê diherê
Xortekî ciwan û rind bûm min ne xast hew dem herê
Bûme kalê va zemana destarim şikî ji gerê
Çerxa felekê buye neyar çep diherê û digerê

Omrê şîn û ciwan xaşe gul vedibin ey felek
Dost û yarê mera pirin ê me dixazin gelek
Talya omra derd û êşe helîna berfa belek
Em di meşin ber mirinê yek bi yek û tek bi tek
Ji derdara em dimînin li dawiyê hey felek

Nêrgiz û tayê rihanê ê di baxê me gî çûn
Bîna ter bayê bi xunav di ser mera derbazbûn
Gurîna topa vê dunê li tîr mahê wendabûn
Payîz hatî bi ser meda mal mîrasê me şabûn
Emî dihen ber mirinê hin ji erdê nu rabûn

Institut kurde de Paris

# Perzer

Heyran perzer çi şêrîne dixunê tim li ser darê
Şairekî mihacire ziman tune tu di bi yarê
Salê carkê tu tê ceme di destpêka her buharê

Perzer dengê te şêrîne naxazim tu herê ji cem me
Li ser çavê me nîvane sî sivike ziman nerme
Lê em zanin tê zû barkê ji tere nabê sar û germe

Min dî rokê serê sibê dunya reşe tu dixwînê
Ro daketî şûna şevê tu hilkiştî ser zeytûnê
Min zanî ew buhar xweşe tîrêj dane li gerdûnê

Tu çû here sed oxirbê heya sala tê çav nêrim
Ji wa dengê te û şadî ji dîtina te ne têrim
Ji zimanê te û zêrî ji dil û can ez guhdêrim

Institut kurde de Paris

# Êvar

Ewr diherin li ezmana ji ber hevdû direvin
Ro ne xaşe li paş ewra têrê ji dor dikevin
Derya kûre gufit sekinî pêl li hevdû nakevin
Herdû çavê te matmane bi ezmana dikevin
Bi çi yarê tu difkirê çiye xewna te û şêrîn

Bi wa erda ro hindabû li ser sirtan û gaza
Bi gulîstanik kesk û hişîn jê qut bû dengê qaza
Li bi wa çûkê difirin ber cikê xwe bi saza
Li bi êvara nu daket li ser gund û bajara
Bi çi yarê tu difikirê çiye xewna te û şêrîn

Ro çû ava diser çara tu me bê çû hew vemir
Tu mefikire di jiyanê pir dibin kul û keser
Melûl bûnê dîn yalîkî li şabûnê tu biger
Bila rûyê te geşbê ro daketî rind li ser
Bi çi yarê tu difkirê   çiye xewna te û şêrîn

Institut kurde de Paris

# Tirba min bikolin

Bila rok bi derketa li mala xwedê di ser çiyara
Şewq û şemala xwe bida bînana deşta wîranşehrê
Tîrêjê xwe lêxista li ruyê kevir û bena li pelê dara
Berî ez bimrim ezê gunhê xwe têxim ustê heval û yara
Bila tirba min bikolin li quracê hêşîn li cem dera
Gêl beriyê li serê sirtan û tundira li pozê wan pesera
Bila tirba min bixemlînin bi dehla geliyê penireka
Bi mişinê çayê beîvê bi rîşê qewaq û biya
Bi çiloyê zêtûn û merxê bi gul û çîçekê ruye kevr û bena
Bi xezola serê wa zinara
Belkî ez bimrim meriyê û xizmê min tinebin
Ezê osîkim li heval û dustan li sê çara
Bila tirba min avdin bi ava gelî û newala
Bi wa sêzinta diherikê li bin çinara
Li ser kêla min dînin cangorê evînê xerîbê welata ji dest yara
Wey lo wey lo wey lo xerîbê welat ji dest yara

Institut kurde de Paris

# Birçiya têrke xêre

Lê lê lê zekiyê çav xezala beriyê
Tu qumrîka kediyê fermo were ser siyê
Nabîsê şora tiyê bike şerm û fediyê
Ka nivişka serê sibê dîne ji mere taştiyê

Kebaniya malê şêre ger mal tijê bi xêre
Were sifra xwe dîne ji qeymax û ji penêre
Ger tu naxê bi mera bimeyzîne û binêre
Wîne tu zerka avê av pîroze ji zêre

Institut kurde de Paris

# Derdê jina elwane

Xelkê xwe kir ez şiyarim    kes bi derdê min nahesê

Eşqa canê dil kewandî    agir têye ji vê nefesê

Canim helî ji evînê    kes hawara min nabhîsê

Zeman bûye fot û derew    soza berê ji namûsê

Tu guh medî çavê belek    şewqa delal jê dibrûsê

Derdê jina tim elwane    bes leylane ve dibrûsê

Institut kurde de Paris

# Parê

# Evînê

# Û

# Dedê dilan

Institut kurde de Paris

# Çarîn

Tu meçîne di oza dilda van birîn û van kula
Wer bixwîne li hember min wek va çûk û bulbula
Ka bi minde tu camekê ji xuşava sor gula
Kine omrê min bêliye natên jimar bi sala

Hey xweda tu derî veke ji hebûna xwe bimide
Çavê me li deryê teye barê kesî li me mede
Me bihêle di evîna bad û camê sermede
Bila serxweş em bimînin ger cîhana me derde

Tişt ji milkê te pir nabê ger nimêkim xwe dînim
Ne ji milkê te kêm dibê ger serê xwe hilînim
Tu min berde te nasdikim ya xudayê alemê
Zû meriya tu dê dixê dereng nesra te dibînim

Berde dilê tê wer nebî di evîn û eşqa yara
Misilman bê di camiya nisranî bê wek yara
Hecî navê wî daketî pitûka evîn dara
Na pirsê li buhişta banî her natirsêye ji ara

Institut kurde de Paris

Li çar û hefta tu çêbûye xwe rat dikê çi li virê
Vexwe çiqa ez didim te şîreta min nagirê
Tu herê tê herê ji vir carekdin venagerê
Ma tu bi nimê û rojibê çima ê li te bigerê

Ger ez negînim wê gulê mitê wê li bîra mine
Ger ez negînim roniyê agirê wê besî mine
Ger ez nebim şêxê bi cube xwe nebînim di tikiyê
Pişt û zengil û kineştek li şwin wa bezî mine

Vexwe berî tu dakevê gora reş û pir tarî
Kes bi tera danakevê tu heval dost û yarî
Bînke tu bîna jiyanê bayê xerbî buharî
Gul çelmisîn qet şîn nabin ser ji nuva tucarî

Sura jiyana me kûre tim ser mij û morane
Heya tu saxbe li cîhanê tê bimînê nezane
Hîn xweşe tu li ser vê axê tu çav girtî û xizane
Ma tu daket gora tarî tê ço bibe hozane

Ey felekê tu nabê yar nabê hevalê camêra
Tu narê li gor dilê peya wan piling û wan şêra
Te çû daxist xudan rûmet bûn hevalê çav berjêra
Tu vedana birûskaye nabê dostê tu mêra

Institut kurde de Paris

Omrê min bayekî kurre di çolêra diherê
Ya wek avekê diherikê li şwin xwe venagerê
Çiqa bimînim li virê e napirsim du tişta
Ro çû ava dihûye yek din li şwinê ê werê

Şansa me kenê belaşbû li royê cana şêrîn
Ji mitê wê me kişandî kul û kovan û nalîn
Şe şenakê biskê yara xwîn şêrîn
Ger nebêye bi sed diranî nebê ji eşqê dil birîn

Institut kurde de Paris

# Sitêrka sibê

Serê sibê tu banî ket nîşana her siban tuyî
Li ezmana li jor vêket êstêrka ber çvan tuyî

Ruyê te û geş bi ronahî şêrîn kir ezmanê sahî
Li kevnarda xilat mayî nîşana her siban tuyî

Tu bû xalek di ezmênda serê sibê di şerqêda
Tu vêketî te ronî da rêbera karwana tuyî

Çi şivan û ji gavana tu li cem waye wek nîvana
Li şar û gund û zozana rêbera rêwîyan tuyî

Tu çelenge hey lê canê roniya te daye cîhanê
Her yek wexta xwe bi te zanê nîvana her siban tuyî

Institut kurde de Paris

# Rê av

Kî va rê ava di dîmê me kûrkir kirî newal
Eşq û evîn di dila zabû hîn ez canbûm bûme kal
Muhbet û eşqa leylayê bejna şêrîn û şepal
Kirim mifteyê dildara di sîngda vebû îmhal

Ayeta eşqê mezine venamire bi mirinê
Erd û ezmanê bilinde natê girtin bi kirinê
Tiştê xudê ger ayet bê hinda nabê ji dunê
Eşq û evîn merhemete şîn dibê li dil dinê

Tarîxa evînê dure ji ademda li vir mayî
Zivistan û berf bi barê tim ezmanê wê sayî
Bi sanciya hatin dunê cinsê hewa pê zayî
Eşq me kom dikê li ser hev wek ji minva tê xuyayî

Institut Kurde de Paris

# Nalîn

Dilo kûrbû bi birînim serxweş û mest û şev şînim
Serxweş û mest û helakim di eşqêda dubirakim
Şeva yarê te dibînim li wê şevê dil şadim ez

Dilo min hicreta yarê kirî ji xwera soz û qerar
Bîna gulê ji wê darê bi omrê minra bûye hew yar
Agrê eşqê ji dûr min dî ber min di tê disojim ez

Sera û koşka te girtî bi wa desta danî li ser hev
Mîna mala xwedê li mekê alem civî li dorê tev
Por sipîme tu ciwane ji derdê te dinalim ez

Di nîvê şeva reşda min dî guliyê yarê li ser rûne
Li dor hîvê siwan vedan bi çavan got were rûne
Hêv bilind ma li ezmana enagînim dinalim ez

Institut kurde de Paris

# Tu nehat

Zanim tu soza xwe tu naxwe nizam xêre tu nehat
Bes vê şevê tu ne li vire sebra dilê min nehat
Mam heta kûranga şevê xew bi çavê min ne hat
Çavê me li rêka te mane rê dinêrim tu ne hat

Dê were yar tu bi minde ji peyala evînê
Dakevin nav bexçê gula serê sibê şevînê
Bila dil têkevê eşqê kêf û şahî têd bimîne
Te çi çandî di axa xuda tê li dawiyê hilînê

Tu bexçê gula sor û zere ezim dînê bejna teme
Dil di nale ji evînê aşiq û xem xwarê teme
Çû li çavê me qelibîn her tirêjê çavê teme
Xêr tu li me venagerê di gel ku ez dilê teme

Va cîhana ger ezmanbe tu têda hêva delal
Va jiyana tev da çavbin tu têda mûm û şemal
Va jiyana tevda reşbê tu têda hîv û xezal
Rehmê xwe bike li vî dilî mane tu jêra heval

Institut kurde de Paris

Çû va temen me derbaskir    di xweşiyê û êşekê
Çavê min bûn gola xwînê    dil dibakê û dipekê
Kêf û şadî ji min dûrin    ji dest tîrên felekê
Ezim dîndarê bejna te    şêrînê çav belekê

Dikim gilî û gazinda    ji evîna te şêrîn
Kuda herim li dunyayê    te ez kirim har û dîn
Ro va derket di şerqêda    dan me têrêjên rengîn
Hatî dengê van bilbilan    dinalin ji dilê birîn

Bi dilê xwe serxweşim    li dunyayê lê yarê
Veda şifaqê di şerqêda    tê min bîna buharê
Hîro çûme ser şehîda    kemal ji bîra min narê
Mirin bi bîra mera tînê    bavê serbest vê carê

Sed hezar carî min pirskir    dilo tu kanê vebê
Ji evîna xwîn şêrîna    xwîn darivî kezebê
Her te canek dî li kuderê    tu di sîngêda har dibê
tu li min bûye bela giran    te da min êş û xezebê

Institut kurde de Paris

# Çend perçe ji rêza

Yar ji min xeyidî nadê min silava
Çavê xwe li min ket istêr berdan ji çava
Kê orta me xera kir mala wî nebê ava

Wê şêrînê kuştim bi çav avêtime paş çayê qaf
Çolek xerab bê nan û av li her dema wendame ez

Narê narê hey narê hey narê
Rû sorê rû henarê hey narê
Min çavê belek xwarê hey narê
Sibe nîro êvarê hey narê

Narê narê hey narê hey narê
Ava kunê kevnarê hey narê
Dînan bin siya darê hey narê
Bi kêf xorta vexwarê hey narê

Institut kurde de Paris

# Ez omrikî vê xortîme

Ez omrikî vê xortîme edewranek vê buharim

Hezkirinek bi kul janim mal xerabim e vê karim

Kê digerê li intizara mila warê wa ez xwarim

Roja ez bûm bûn dina min gavek tarî û gelek reşbû

Li min barî berf û baran bûm pişt xar dîmêm geşbû

Gulê şêrîn tev çilmisîn pirç li min sipî reşbû

Were cemin ezê dînim li rêka te roya çava

Di cigêrda were rone me cîk kirî ji tera ava

Ger tu werê kêleka min dibim roja li ser dilava

Institut kurde de Paris

# Bayê sibê

Rabe em bînkin bi hevra ji bîna bayê sibê
Berî xelik rabê ji razanê xulmaş bibe ji xewê
Xaş qebqeba moriyê di tê dengê kewa li pozê çiyê
Çiya serxweş mest ketiye ji wa kêfa pir delal
Di herikê li kêlekê kaniya ava zelal

Xasteka me em bîn bikin dêmê rind û sorgulî
Bejn û bala wê şêrînê li hev hat û xemilî
Hamêz bikin bi va zenda ji vî canî ji vî dilî
Lome nabin li wa bejna pir buha û pir delal
Di eşqêda omrê me çû em kirne pîr û kal

Çiqa tu li vî geliyî bigerê bi çava tu lê binêrê
Dûşekek kesk û hişîne hatî danîn li virê
Li ser raketî çav xezalek heyrana wê dîlberê
Qumriya bax û bistana narîna bi husn û cemal
Bejin xemilî ji avdanê ji kaniya ava zelal

Yarek xwe bigre li cîhanê tu guh mede tu kesî
Heyat xweşe bi yarara wek cigirêm pê hesî
Bibe nîvana gula sipî hewce nabê tu kesî
Bejin fodil kesk û şîne ya geyike ya xezal
Tê li siya wê bimînê çiqe herê dem û sal

Institut kurde de Paris

Tu menale li vê dunê ji wî dilî mebê ax
Can ketî axa cîhanê xemilîne şax û bax
Bi destê yezdan em çêbûne ser ji nûva di bin ax
Tu li yarek xwe bigere dêm gulî şeng û şepal
Yar hevale li cîhanê pê xaş dibin milk û mal

Tu li yara xwe menêre wek qeramê ser ava
Ba lêdixe û dihezînê li ciyê xwe pir gava
Bik bilûrek li bejnê xemilî ji kilê herdû çava
Dîn li ser lêva qurmizî pifêke malî ava
Sed hezar awaz dibêjê  bilûra rind û delal
Ê mala te şîn bikê ger qonax bê ger jî çal

Institut kurde de Paris

# Xurbeta min

Min hezkirbû ji çavê tenî bi kil
Pora te û hindî berdaye li ser mil
Pir li hev hatî bejna te her ji dil
Welle min dîbû li dunê hezar gul
Ez pê ne hesîm ne hejandin ev ji dil
Dê were were were narînê          li hêvya teme bejin şêrînê
Eşq û evîn avek zelale
Ma kê dijê hew ne helale
Heçî jê vexwar dil nabê kale
Ava heyatê pak û delale
Nayê vaxarin bêyî hevale
Dê wre were were koçerê          berî em barkin herin ji vêderê
Te ez dînkirim berê min da çola
Bûme padîşahê derdan û kula
Derdê min ranabin bi meh û sala
Raman digerê li ezmanê heftê
Ez bûme bilbilê çîçek û gula
De were were were lê yarê          tu li ber dilê min gula buharê
Roja te dibînim dunya buhare
Sersal û eyde mehe adare
Bayî diweşe xunav tê xare
Cîhan tev xaşe ji xweber gulzare
Dengê bulbul û çûka li dare
Dê were were were li yarê
Li ber dilê min bi xwe buhare

Institut kurde de Paris

# Naverok

Pêşgotin
1
Diyarî 4
Hekîmê derdan 5
Hewar dikim 9
Belengazin 11
Tu ne kevin û ne ecere 12
Ser siye quranê 14
Bi serda dilê min birişt 16
Bûme ser gewr 17
Pir poşmanim 19
Ey xweda 20
Eyda qurbanê 21
Pencik av 22
Dawî dûre 24
Bûn cîranê kevira 26
Vê ibretê rake ji min 27
Xewna dil 29
Sal vegera şehîda 31
Serxwebûn 33
Welatê kurda 35
Kurdistan birîndare 36
Suriye 37
Rêçe nasê miletê kurd 38

Institut kurde de Paris

| | |
|---|---|
| Kurdistana rengîn | 41 |
| Li ser çiya tim keleşim | 43 |
| Darbesta şehîda | 44 |
| Kurd hildabûn ruyê dara | 45 |
| Helebçe | 46 |
| Bîst û yekê avdarê | 48 |
| Raperîn û ser hildan | 49 |
| Kurdistana sor û zer | 50 |
| Agirê şoreşê | 51 |
| Xortê welat | 53 |
| Cangorê welat | 54 |
| Aşiqim çiya | 56 |
| Keça kurdî | 59 |
| Bajarê şehîda helebçe | 60 |
| Bîranîna serok berzanî | 65 |
| Rêbere bi nav û nîşan | 67 |
| Gora serok berzanî | 70 |
| Tu kuda di herê ey malî ava | 71 |
| Kanî şêx muhemed | 74 |
| Şîna heval kemal ehmed | 75 |
| Dayka dilovan | 78 |
| Bavê min | 79 |
| Bavê ehmed horîk | 80 |
| Dibistan | 83 |
| Çira vêxin | 84 |
| Jin | 85 |
| Gula kose | 86 |
| Gula kose 2 | 88 |
| Hefkî diherê di xemile | 90 |
| Çayê gewir | 91 |

Institut kurde de Paris

Gotarî 93
Camêrî û çekûzî 94
Gundê me 95
Payîz hatî bi ser meda 97
Perzer 98
Êvar 99
Tirba min bikolin 100
Birçiya têrke xêre 101
Derdê jina elwane 102
Çarîn 104
Sitêrka sibê
107
Rê ava 108
Nalîn 109
Tu nehat 110
Çend perçe ji rêza 112
Ez omrikî vê xortîme 113
Bayê sibê 114
Xurbeta min 116

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris

Institut kurde de Paris